

# Ziman **U** Zar

---

**Jimre 2 - rêbendanî- 2721- zistanî 2021**

---

Govarekî zimannasî ya werzî ye

**Xudan îmtiyaz:**

**Dr. Teha Resûl**

**Sernivîserê fexrî:**

**Tofîq Wehbî**

---

**Sernivîser:**

**Fereydûn Saman**

---

**destey rawjêkarî:**

- d. hogr mehmed
- d. mîzgîn çalî
- d. dara hemîd
- d. sadq hemexerîb
- d. derya cemal hewêzî
- kameran rehîmî
- îdrîs lawe

**Rawêjkara kargêrî: Evîn Ehmed**

**peywendî: sara saadî**

**xezan baban**

Ji bo peywenîdî bi Ziman u Zar  
fereydunsama61@gmail.com





---

# FERHENGSAZÎ DI ZIMANÊ KURDÎ DE

---

■ XALID CEMÎL MIHEMED

## Derbarê ferhengê

Ferheng pirtûkek e peyvên zimanekî yan bêhtir ji zimanekî li xwe digire. Ew peyv li gorî sîstemeke diyarkirî têne rêzbandkirin, di nav de jî danasîn, şirovekirin, hevwaterkirin, akar û zanyariyên pêwendîdar bi wan peyvyan, derbas dibin, ku nav, lêker û daçek, herwiha mêjer û zayenda navên nêrza, mêza û nêtar û lêkerên gerguhêz û negerguhêz, ji hev têne diyarkirin. Awayên bikaranîna wan peyvyan, di aşt û çarçoveyên têvel û cobicor de, herwiha bilêvkirina her peyvekê, tê nîşandan û mînakên guncaw û diruşt, li ser têne bicihkirin.

Ferheng yek ji çavkaniyên wergirtina aşnayî, zanyarî û zaniştê ye, herwiha ziman, peyv, pend û nerîtên civakê ji windabûnê diparêze û materyalên zimanan ji nişkekî vediguhêze nişkekî din, bi wateya ku ew kenaleke pevghiştin û danûstandina rewşenbîrî, hizrî û zimanî ye, di navbera nişên çûyî û yên hatî de. Hevdem alîkariya bikarhênerê xwe dike, ku bizanibe peyv çî ye, çî wateyan dide, akarên wê çî ne, awayên bikaranîna wê çî ne, danasîn, wate, hevwater û dijwaterên wê çî ne. Peyvên kevn û peyvên nû jî, li xwe digire, dibe ku dîroka her peyvekê ji wan jî bişopîne û nîşanê pê bide. Êdî bi hebûna ferhengan ziman zindî û dewlemend dibin. Peyvên belavbûyî, heyî, resen, sexte û neresen jî, ji hev têne cudakirin.

Bikarhênerê ferhengê, ji bo naskirina awayê raşt ji nivîsîn, bilêvkirin û bikaranîna peyvyan û ji bo wergirtina zanyariyên girêdayî wate û rewşa wan, li wê çavkaniyê vedigere, êdî ev yek bi xwe jî sedema sereke bû, ji bo diruştkirin û çêkirina ferhengan, ku encama erkên dem û salên dirêj in, ji kar û şopandina peyvyan û belgekirina zanyariyan, di nav de jî, gelek warên huner û zaniştê tevlî wî karî bûne, heta ku ghiştiye vê radeya ku aniha ferheng tê de, tê dîtin.

Gelek corên ferhengan hene, ji wan: Ferhengên yekziman, duziman, pîrziman, babet û mijaran û ensîklopedya, herwiha ferhengên resenasî (îtîmolojî), ferhengên termên pîsporiyê û warên taybet, ferhengên bi wêneyan, ferhengên elektronî û etlesên ferhengî. Di vê çarçoveyê de, çend pirs têne holê: Ferheng ji bo kê tê çêkirin? Kî wê ferhengê bikar bîne? Di çi waran de ferheng wê bê bikaranîn? Armanc ji ferhengê çi ye? Gelo ferheng xwestekên bikarhîneran bicih tîne? Gelo bikarhênerê ferhengê li ber çavan hatiye girtin?

### **Ferhengzanî û ferheng sazî**

Peywest bi ferhengê, karê ku ew berhem li gorê tê danîn, organîzekirin û sîstematîkîkirin, jê re (Ferheng sazî) ango (Lexicography) tê gotin. Lê karê ku xwendin, analîz, şirovekirin û lêkolînê li ser ferhengê dike, jê re (Ferheng zanî) ango (Lexicology) tê gotin. Ferheng sazî û ferheng zanî jî du warên zanîstî yê cuda ne, lê bi hev re pêwendîdar in, her yek ji wan guhdanê dide aliyekî taybet ji ferhengê, wiha jî pêwîstiya wan bi warên din ên zanîstî û zimanzanîne heye.

### **Ferheng zanî**

Ferheng zanî, ango (Lexicology), analîz û lêkolînan li ser ferheng, peyv û wateyan, di zimanekî yan bêhtir ji zimanekî de, encam dide. Guhdanê bi dariştin, straktûr, wate, hev wate û dijwateyan dike. Hev dem zanyarî û akarên ferheng û peyv nîşan dide.

Di vî warî de, pirtûkxaneya Kurdî, di kêmasiyeke mezin de ye, ku ev beş ji zanîstê hatiye piştguhxiştin û xemsariyeke berbiçav, di vî warî de heye, ji ber ku bi sedan ferhengên Kurdî hene, lê bi awayekî zanîstî û li gorî pêwîstî, nehatine analîzkirin, şirovekirin, danasîn, rexnekirin û nirxandin. Ev xemsarî û piştguhxiştin, ne tenê ji aliyê lêkoleran ve tê dîtin, lê belê sazî, rêxiştin dezgehên rewşenbîrî, kovar, rojname, ragihandin, dibistan, zanîngeh û peymangeh guhdaneke berbiçav û girîng li gorî pêwîstî, nedane vî warî.

Zimanzanan û ferhengkaran bi xwe jî, ev war piştguh xîstiyê, bi awayekî ku nebûna lêkolînên akadîmî, zaniştî yên aştîbilind û pêşketî, li ser ferheng û ferhensaziyê, di Zimanê Kurdî de, bûye diyarde. Pêwîstiya vê diyardeya nerênî, bi çaksazkirineke yekalîker heye, ku êdî ferhenga Kurdî ji nexweşiyên xwe yên herdemî, saxlem û pak bibe.

### **Ferhensazî**

Ferhensazî, ango (Lexicography), pîşesazî û awayê danîn û çêkirina ferhengê ye, ji aliyê danhev, komkirin û berhevkirina peyvan û eşkerekirina wate û zanyariyan, herwiha organîzekirin û rêzbendîya materyalên zimani, di nava ferhengê de, li gorî sîstem û rêbazeke diyarkirî, zelal û hêsan, piştî berhemanîna pirtûka ku bi (Ferheng) tê binavkirin. Ev beş ji kar, bêhtir sûdê ji encamên ferhengzanî û zimanzanîne werdigire.

Ferhensazî ne tenê karekî hunerî ye, lê pêwîstiya wê, bi aliyên têvel ji zaniştan heye, ji bo ku rêbaz, rêkar û encamên wê, ji raştîyê nêzîktir bin, lewma paşgira (-sazî) ligel navê (Ferheng-)ê hatiye bikaranîn û bûye (Ferhensazî), bi wateya ku ev kar pîşesazî ye, ango huner û zanişt e.

Ev beş ji kar jî, di pirtûkxaneya Kurdî de, hatiye perawzîkirin, sedema wê jî ew e, ku heta niha, bi fermî navendeke kara, aktîv, berhemdar û taybet bi ferhensaziyê nîne. Hejmara kesên pirspor û şarezayên vî warî gelekî kême, lê bi ser kêmbûna hejmara wan de jî, guhdan ji aliyê zanîngeh, peymangeh, sazî, dezgeh û rêxistinên rewşenbîrî yên Kurdî ve, bi erkê wan nayê dan û alîkariya pêwîst ji bo berdewamî, pêşxistin û geşkirina vî warî, ji wan re nayê pêşkêşkirin.

### **Destpêka ferhensaziya Kurdî**

Ferhengên ku Zimanê Kurdî tê de cihekî digire, heta aniha, li gorî şopandin û pişkinîna vê lêkolînê, ne bêhtir ji (250) ferhengên corbîcor



in, Di derbarê hejmara ferhengên Kurdî de jî, yan ferhengên ku Zimanê Kurdî beşek jê ye, li gorî zanyarî û agahiyên ku hene, heta niha pirtûkek yan lîsteyeke biblyografî ya giştgir, weke fehrişta çavkanî, jêder, sernav û mijarên wan ferhengan, ji bo pirtûkxaneya Kurdî, nehatiye amadekirin, di encama vê rewşê de jî, lêkolînên li ser ferhengên Kurdî, tûşî lawazî, kêmasî, zehmetî, kêşe û pirsgirêkan dibin. Ferhengên ku nû têne çêkirin jî, nikarin bi awayekî baş sûdê ji hemû berhemên berî xwe bibînin.

Deştpeka texmînkirî ya yekem ferhenga Kurdî, ji sala 2019an ve, vedigere berî derdora 330 salî, ku Ehmedê Xanî (1682-1683-yê zayînê) bidawî anî û navê wê kire (Nûbara Biçûkan) û bi (Nûbihara Biçûkan) hatiye naskirin û belavkirin. Ew jî bi şêwazê honrawê hatibû riştin û hûnandin. Nêzikî hezar peyvê, di 216 malikan de, li xwe girtiye, ku ji bo fêkirina zarokên Kurd hatibû amadekirin.

Piştî wî, bi 116 salan, Şêx Marûfê Nûdehî, (1798-1799-ê zayînê) ferhengek bi navê (Ehmedî) danî û tê de, da ser şopa Ehmedê Xanî. Piştî êdî bi dehan ferheng derketin, heta sedsala 20em, ku tê de, bêhtir ji 100 ferhengên Kurdî derketin, lê di deştpeka sedsala 21em de, êdî berhem di vî warî de bêhtir bûn.

## **Zimanê Kurdî di Ferhengsaziyê de**

Di sedsala 21em de, hevdem ligel pêşketinên mezin li ser asta cîhanê, Zimanê Kurdî, di warê ferhengsaziyê de, rûbirûyî gelek kêşe, pirsgirêk û gîrûgiriftan bûye, tevî ku hewl têne dan ji bo kêmkirina wan astengiyan, lê hêj pêwîstiya Zimanê Kurdî bi cimûcol û tevgereke berfirehtir heye, ji bo çareserkirina nexweşiyên ku di warê ferhengsaziyê de, tûşî wan dibe.

Ev rewş di demekê de ye, ku ferhengên elektronî yên miletên din, bi şêweyekî gelekî pêşketî hatine çêkirin, wiha jî, di Zimanê Kurdî de, hinek gav hatine avêtin, lê bi sedema nebûna navend, dezgeh û sazîyên pispor û plandanînen raşteqîne û zaniştî, kêmasiyên wan gavên avêtî jî gelek in.

Heta niha, li ser asta tevaya Zimanê Kurdî, ferhengeke yekbûyî û giştgir nehatiye çêkirin, ne jî li ser asta zarava, jêzarava û şêwezarên teka teka yan zarava û şêwezarê navçeyekê bi xwe, ferhengên giştgir û pêşketî nehatine peydakirin, ango ferhengeke Kurdî peyda nebûye, ku cihê piştgirêdanê be, ji ber ku hêj berhevkerin û şiroveyên materyalên her ferhengekê kêmasî û şaştiyên mezin û biçûk hildigirin û nîşan didin, hevterîpî wê jî, lêkolînên rexneyî yê zaniştî dernakevin.

Ferhengên ku hene, bi tak û bi kom mînendî û nûnertiya hemû gencîneya Zimanê Kurdî nakin, ne jî nûnertiya beşekî berfireh jê dikan, ji ber ku her ferhengek ji wan, bi hezaran materyal û peyvên girîng, li xwe negirtine, lê belê jîdeşt jî dane, êdî heta niha, wan ferhengan nikarîbû, di berhevkerina materyalên zimanî de, sûdeke raşteqîne û biber ji dewlemendiya Zimanê Kurdî û zaava û şêwezarên wî bikin, di encamê de jî, bi hezaran peyv û şêwaz hatine windakirin, bi hezaran jî, şaşti derbasî nav ziman bûne.

Bi heman awayî koçbûna dawî ya her kalemêrekî yan pîrejinekê, ligel xwe bi sedan peyv û şêwaz winda kirine. Ev yek jî rewşa lawazbûn, kêmasî, xemsarî û kêmguhdanê, di ferhengersaziya Kurdî de, diyar dike. Kêmasiya din jî, di wergirtina şaştiyan de ye, ku ferhengkarê hatî ji yê çûyî werdigire, bêyî ku pişkinîn û hûrbîniyê, di proseya berî xwe de bike, êdî materyalan tevî şaşti, çewtî û nexweşiyên wan, vediguhêze.

### **Nirxandina Ferhengersaziya Kurdî**

Piraniya ferhengên Kurdî tijî şaşti ne, êdî gazina bikarhêneran ji wan heye, ji ber ku şaştiyên wan ne hindik in û ne jî demkî ne, lê belê ew xwedî kemûkurî, kêmasî û nexweşiyên demdirêj in, ku vedigerin berî niha bi 330 salî, dema ku Ehmedê Xanî (Nûbuhara Biçûkan) derxist û

di vî warî de bû pêşeng û rêber, êdî ji hingê ve heta niha, heman cor û heman şeweyê wan şaştiyan dûbare dibin û bêhtir dibin. Ew yek ji ber ku hinek danerên ferhengan piştî xwe bi karîna axaftinê û hejmarê çend peyvên li cem xwe girêdane, lê ev yek nikare şûna karînen zaniştî, hunerî, teknîkî û rewşenbîrî bigirin.

Bi ser kêmbûna lêkolînên zimanî yê Kurdî de, ferhengsaziya Kurdî jî hate piştguhxsitin. Piraniya ferhengên Kurdî, ne li gorî hêvî û daxwaza xwendevan û bikarhênerên xwe ne. Ew jî bi sedema bêserûberiya rêbaza wan ferhengan û şaştiyên di ziman û rênivîsa wan de, herwiha cîbicînekirina gelek binema û mercên ferhengsaziyê, bi taybetî nivîsandina rast û dirust, kêşana nav û lêkeran, danasîn, hevwaterkirin, şirovekirin, wergirtina zanyariyan, wergerandin, rêfêrans û lêvegerandin, bikaranîna mînak, lêkolîn û şopandin û gelek têbîniyên din.

Ferhengsazî li ser du binemayên sereke tê avakirin, yekem: Rêzbendî ye. Duwem: Danasîn e. Bi van herdu binemayan, nasnameya ferhengê tê diyarkirin, ji ber ku nebûna rêzbendiyê ferhengê bêserûber dike, wiha jî nebûn yan şaştiyên danasînê ferhengê bêsûd dike, lewma dibe bê gotin ku piraniya ferhengên Kurdî bi kêmasî yan nebûna danasînê, tenê mane xişte yan liştayên rêzkirina peyvan, ji ber ku tenê di warê berhevkirin, komkirin û rêzbendkirina peyvan de ne, bêhtir jê ku materyalan li gorî pêwîstî şirove bikin û akarên wan nîşan bidin. Hevterîpî nebûna danasînê jî, bi piranî şaştiyên rîzbendiyê hene. Êdî bi cîbicînekirina van herdu binemayan, ferheng du mercên sereke ji bo serkeftinê jîdest dide, ku bêyî wan, ferheng weke bînderekê ji gotinên komkirî tê dîtin.

Yek ji giriftên sereke û balkêş di ferhengsaziya Kurdî de, danasîn e. Ew jî bi çend awayan diyar dibe, ku şirovekirin, hevwaterkirin, dijraberkirina peyvan, mînak û rêfêrans girêdayî vê binemayê ne. Nezelalbûn di danasînê de peyda dibe, yan jî rêfêransa wê şaş e, ku bikarhêner vedigerîne

devereke din ji ferhengê lê ew materyala ku ji bo wê rêfêrans bikar aniye, li wê devera diyarkirî nehatiye bicihkirin û pabendî pê nehatiye kirin.

Ji kêmasiyên ku di ferhengên Kurdî de derbas dibin, şaştiyên rênivîsê ne, ku beşek ji wan vedigerin şaştiyên ferhengkar di xwendin, nivîsandin, veguhaştin yan çapkirinê de.

Kêşeya nihênî û pirwatebûnê jî heye, ku yek peyvyan xwedî bêhtir ji wateyekê ye, li gorî çarçoveyên bikaranîna wê peyvê, bi şêwazê rasteqîne yan mêtâfor (mecazî) ji peyvê re.

Pêwîstiya Zimanê Kurdî, tenê bi take ferhengê nîne, lê belê pêwîstiya wî bi prose û rêbazeke berdewam heye, ku her demê pêvajoya ferhengsaziyê lidar be û kesên şareza û pispor, bi erkên takekesî û erkên giştî, di hemû warên zanişt û jiyane de, ferhengên biçûk û mezin amade bikin.

### **Sedemên lawazbûna ferhengsaziya Kurdî**

Tevî rola girîng a ferhengên Kurdî ku hatine çêkirin û bihayê wan, ku cihê rêzgirtinê ne, ferhengsaziya Kurdî di rewşeke kevneşop de ye. Giriftên sereke yê wê proseyê girêdayî ziman in. Ziman jî, binemaya sereke ye ji ferhengsaziyê re, lê kêmasiyên wê proseyê, di Zimanê Kurdî de, gelek in, ji wan jî:

1- Nebûna lêkolîn û gotarên rexneyî ji bo rêgirîkirinê li pêşiya bêserûberiya di warê ferhengsaziyê de, ku dibe ev lêkolîn û gotar sînoren tund li ber wê rewşa nexwestî deynin û proseya ferhengsaziyê organîze bike û rê li ber xweştir bike, ku êdî ne her kes xwe di vî warî de şareza bibîne yan li jêr diruşma xizmeta Zimanê Kurdî, ferhengsaziyê û ziman têk bide.

2- Nebûna lêkolînên analîzekirin û şirovekirina ferhengan.

3- Nebûna lêkolînên zimanzanînê.

4- Nerûniştina gelek rêsayên rêziman û rênivîsê.

5- Kêmzanîna piraniya ferhengkaran bi karê ferhengsaziyê û mercê binema û pêdiviyên wê.

6- Zehmetî, kelem û astengiyên siyasî, abûrî, civakî, zanistî û rewşenbîrî di civaka Kurdî de, ku bandoreke nerênî li ser karê ferhengsaziyê dikin.

7- Hêsandîtina proseya ferhengsaziyê û sivikayetiya bi vî karê ku serkeftin tê de, girêdayî pêkanîna gelek mercên zanistî, hunerî, zimanî û pisporî ye.

8- Lawazbûn û neşarezahiya piraniya kesên ku di warê ferhengsaziyê de kar dikin. Gelek ji wan jî, li kêleka yan li perawîza çend karên din, di vî warî de jî, kar dikin û li benda rasthatinê (sudfeyê) ne, ku peyveke nû bibînin, yan jî bi ser zanyariyekê vebin, li şûna ku ew bi xwe lê bigerin û lêkolîn û pişkinîneke baş û berfireh bikin, ne li benda wê rasthatinê bin, ku dibe çê nebe.

9- Erkên ku di vî warî de hatine pêşkêşkirin, heta niha erkên takekesî ne, ne bûne erkên giştî û ji çarçoveya karê hunerî û teknîkî derneketine warê zanist û pîşesaziyê di çêkirina ferhengan de, ku pêwîstiya wê bi plan û rêbazên taybet heye, ne tenê di rêzbendî û naverokê de, lê belê di kêsim, dîzayn, deranîn û awayê çapkirinê de jî.

10- Nebûna sazî û dezgehên ku piştgiriya vî karî bikin û erkên ferhengkaran ji hev nêzîk û berhev bikin, ji bo berhemanîneke bisûd û encamdana Şoreşeke Ferhengî ya serkeftî, ku pêwîstiya Zimanê Kurdî pê heye, da ku derkeve asteke bilindtir û di warên hizr, zanist û wêjeyê de, berhemine baştir bide, heriwha di warên piştgirî û alîkariyên, zanistî, darayî, teknîkî, hunerî û moralî de.

11- Bi piranî, gelek sedemên lawazbûna ferhengên Kurdî, şaştîyên girêdayî rêzbendî, wate, hevwaterkirin û şirovekirinê ne, herwiha girêdayî zanyarî û mekanîzmayên bikaranîna ferhengê ne.

12- Nebûna term û zaravên hevçerx û nû, li beramber hezaran têrmên ku di zimanên din de derdikevin.

13- Neyekbûna alfabê û tîpên nivîsandinê jî, yek ji sedemên lawazbûn û astengiyên ferhengsaziyê ye, ku ev rewş nahêle erkên cuda, di yek karî de, bigihêjin hev û li ser yek sîstema zanîstî û li jêr yek sîbera dezgehî kar bikin.

### **Girîngiya ferhenga Kurdî**

Ferheng ne tenê pirtûkeke berhevkerin, komkirin, rêzbendkirin û şirovekirina peyvan e, lê belê xwedî rol û girîngiyeke mezin e, di warê wergirtina aşna û zanyariyan de, bi taybetî di warê ziman de, bi rengekî ku pêkan e bikarhênerê ferhengê, bi rêya wê, zanyariyên rasteqîne derbarê awayê raştîvîsîn, wate, hevwater, dijwater û astên bikaranîna peyvan werbigire û fêr bibe, herwiha şewazên rasteqîne û mîtaforî yên bikaranîna peyvan jî binase, ango pêwîst e ferheng derfetekê peyda bike ku heta radeyekê, bikarhênerê wê di warê fêrbûna ziman de sûdmend be. Hevdem, di çarçoveya bikaranîna ferhengê de, bikaribe zanyariyên girêdayî ziman, çand, rewşenbîrî û dîroka ziman û civakê jî bibîne û bideşt bixe.

Pêwendiyeyeke xurt di navbera proseya fêrbûna ziman û ferhengê de heye, bi awayekî ku ferheng ayîneyeke jiyana civakê û takeksan e, herwiha rengvedana bîr, hizr û baweriyên civaka xwe ye, êdî dema ku ferheng peyvan li ber deştê xwendevan datîne, ligel wê yekê jî, zanyariyên girêdayî wan peyvan berdeşt dike, bi roleke aktîv û kara radibe, ku rê li ber wî vedike ji bo wergirtina gelek zanyariyan, lewma jî ferhengên ku tenê peyvan rêzbend dikin û li beramber her peyvekê tenê peyveke şiroveyê yan bêhtir ji peyvekê datînin, sûd ji wan heye, lê her ew sûd nagihêje asta ku tê xwestin, ew jî berawird bi ferhengên ku bi zanyariyan

dewlemend bin. Bi wê yekê samanê ferhengê, ne tenê di hejmara wan peyvan de ye, ku li xwe digire, lê belê tevî wê akarê jî, samanê ferhengê di wan zanyariyên zimanî, zaniştî, wêjeyî, dîrokî û civakî yên rasteqîne de ye, ku li ber bikarhênerên xwe datîne.

Di ferhengên yekziman ên Kurdî-Kurdî de, dibe ku bikarhênerê wî corî ji ferhengan, sûdeke baş bibîne, lê di ferhengên duziman yan pîrziman de, dibe ku kesên şarezayên wan zimanên din jî, sûdê bibînin, ku heta radeyekê, fêrî beşekî gelek ji Zimanê Kurdî bibin, yan jî zanyariyên girîng derbarê wî zimanî werbigirin, bi mercê ku ew ferheng binemayên ferhengsaziyê peyda bikin û di astekê de bin, ku bawerî bi zanyariyên wan bê, wiha ferheng dibe yek ji çavkaniyên wergirtina zanyariyên zimanî, zaniştî, rewşenbîrî, dîrokî û civakî, lê hevterîpî wan karan jî, fergeng dibine beşek ji çavkaniyên sereke yên fêrbûna zimanekî yan bêhtir ji zimanekî, di astên bilêvkirin, dengsazî, şirovekirin, danasîn, rênivîs, peyvsazî, rêziman, watesazî û gelek astên din ên ziman, tevî ku bi vî erkî ferheng nikare cihê pirtûkên taybet bi wan waran bigire, lê dikare zanyariyên seretayî, sereke, bingehîn û rasteqîne nîşan bide.

Ji berî 350 salî ve, Ehmedê Xanî gaveke girîng di vî warî de avêtibû, ku ferhenga (NÛBARA BIÇÛKAN) ji bo fêrkirina zarokên Kurd, bikar anîbû, lê ev gav nebû bername û nerîteke berdewam, ne jî bi berfirehbûnekê bû, ku gelek zanyariyên zimanî nîşan bide, ji bilî hevwetakirin û şiroveya peyveke Erebî bi peyveke Kurdî, ku bi piranî heta roja îro, ferhengên Kurdî bi piranî, li ser rêbazeke bi vî awayî birêve diçin û hejmareke gelekî kêma ji wan ketine warê şirovekirina peyvan û nîşandana zanyariyên girîng li ser wan peyvan.

Da ku ferhenga Kurdî xwedî girîngî û roleke karîger û bibandor be, pêwîst e bi awayekî zaniştî û serkeftî, di form, şêwaz û naveroka xwe de, hatibe sazîkirin û amadekirin, ango herdu binemayên sereke

yên serkeftina ferhengê, ku ew jî rêzbendkirin û şirovekirin in, tê de peyda bibin, wiha jî danasîn, wate, hevwater û dijjwaterên peyvan tê de bêne bicihkirin. Hevdem, bi mebesta tijîkirin û çaksazkirina valahiyên ferhengî, divê bi ser zarava, jêzarava û şêwezarên Kurdî yên cuda de, vekirî be. Êdî bi wê rêyê, bikarhênerê ferhengê dikare gencîneya xwe ya ferhengî, zimanî, hizrî û rewşenbîrî dewlemend bike, bi watera ku ligel wergirtina zanyariyên zimanî ji naveroka ferhengê, gelek zanyariyên nezimanî jî werdigire, di nav de jî dikare peyvên resen û yên neresen bibîne û wan ji hev cuda bike.

Hebûna peyvên biyanî li şûna peyvên Kurdî yên resen jî, yek ji astengiyên li pêşiya fêrbûna rast û dirust e, ku beşek ji ferhengan, tevî hebûna peyvên Kurdî yên resen, piştî xwe bi bicihkirina peyvên biyanî yên Erebi, Farişi, Tirkî, Fransî yan Ingilîzî girêdidin, êdî ev yek ji bo fêrbûnê dibe astengiyêke din, weke çawa dibe pisgirêkek li pêşiya resenî, pakî û taybetmendiya Zimanê Kurdî.

Bikaranîna ferhengan gaveke berdar û bisûd e, ji bo ghiştina bi gelek zanyariyên ku dibe bi hêsanî neyên bidestxistin û zû jî peyda nebin, lewma zimanzan, ferhengzan û ferheng saz tekeziyê li ser mifadîtina ji ferhengan dikin. Ji wan sûd û mifayan jî:

- Naskirina rêzbendiya zaniştî, rêbazî û raşteqîne ya peyvan, li gorî corên cuda yên ferhengan.
- Naskirina wate û awayên raşteqîne û mîtaforî yên peyvan, di ast û warên cuda de, bi awayekî ku zanyariyên corbîcor bêne wergirtin, ango dewlemendkirina gencîneya zanyariyên cuda, li cem bikarhênerê ferhengê, bi rêya bihêzkirina bîrewerî, têgihîştin û hişyariya wî.
- Naskirina hevwater û dijjwaterên peyvan, ligel mînakên guncaw ji her warekî re, da ku bikarhêner hevwater û dijjwateran tevlihev neke, weke mînak, cudabûna di navbera (weberhêner) û (weberhatî) de, wiha



jî· di navbera (dilşikestî) û (dilşikên) de· herwiha di navbera (sitemkar) û (sitembar) de û di navbera (kujer) û (kuştî) de.

- Naskirina peyvên pêwendîdar û girêdayî hev· bi awayekî ku lêvegerandin û rêfêransê di navbera wan de pêk bê· ji bo ku bikarhêner ji peyvekê here peyvên din ên pêwendîdarên wê· êdî biser zanyariyên nûtir vebe û taybetmendiya wê girêdana navbera wan jî binase.

- Naskirina şewazê rasteqîne di rênivîsê de· bi mercê ku ferheng cihê baweriyê be· di vî warî de· herwiha hemû cor û şewazên nivîsîn û bilêvkirina peyvan li xwe bigire· da ku bikarhêner ne tenê yek corî ji nivîsîn yan bilêvkirina wan binase· êdî nema corên din bipejirîne· weke mînak (ezman· asîman· esman)· (am· ap· mam· yan jî peyvekê li cihekî bi corekî ji nivîsînê bibîne û li cihekî din heman peyvê bi corekî cuda bibîne· bêyî ku girêdanek di ferhengê de· di navbera wan corên cuda de· hebe.

- Naskirina awa û corên bilêvkirina peyvan· bi taybetî di wan peyvan de· ku guherîn di dengine wan de peyda dibe· weke (ta) û (ta)· ku (ta)ya yekem sivik tê bilêvkin· lewma tîpa (t)êyê nehatiye tarîkirin· êdî wateya wê (taya nexweşiyê) ye. Lê (ta)ya duyem· (t)êya wê hatiye tarîkirin· ku ew jî (tayê dirûtinê) ye· wiha jî (zave) ku yekeya (z) tê de sûtr e· weke (z) di peyva (zirne) de· lê (z) di peyva (zêr) de· sivik e· êdî pêwîstiya wê bi tarîkirinê nîne. Şiroveya vê rêbazê jî· dibe ku di destpêka ferhengê de· bê diyarkirin û ronîkirin· ev yek jî heta niha di ferhengên Kurdî de pêk nehatiye.

- Fêrbûna awayê bilêvkirina diruşt ji tîp û peyvan re· ku ev yek jî girêdayî awayî raştînivîsîna wan e· weke mînak· raştînivîsîna tîpa yekem ji (can) û (jan)· û tîpa duyem ji (zer) û (zêr) yan (şîn) û (şên) û tîpa sêyem ji (dev) û (dew) ku ew guhertin bandorê li wateyê jî dike.

- Naskirina çarçove û astên bikaranîna peyvan· bi rêya anîna mînakên guncaw· ku di şiroveyê de alîkar bin û wateyan zelaltir bikin.

- Naskirina cor û formên peyvan· di warê peyvsaziyê de· ku dibe

cudabûn di navbera wan forman de hebe, weke mînak: (fêrkirin) û (fêrbûn), (mezinbûn) û (mezinkirin), (perîstin) û (paraştin), (sitembar) û (sitemkar).

- Hêskirin, berhevkin û puxtekirina zanyariyên girîng, bingehîn û sereke, bi awayekî ku bikarhênerê ferhengê di zûtirîn û kurtirîn dem de û bi kêmtirîn erk, bigihêje nerîneke zelal û ronî, derbarê pev û wateyan.

- Heta radeyekê, pêkan be ku ferheng xwedî rol û bandor be, di fêrbûna xweser de, ji bikarhêner re, bi bêyî alîkariya ti mamosteyekî.

- Naskirina reseniya peyvên û nîşanpêdan bi peyvên biyanî, bi rêya simbol û hêmayeke guncaw, ku biyanîbûna wan bê diyarkirin.

- Fêrbûna rêzbandiya Alfabeya Zimanê Kurdî, ku pêwîst e, hinek zanyariyên sereke û bingehîn, di destpêka ferhengê de, bêne nîşandan, herwiha zanyariyên rêzimanî yên sereke bi rêya şirovekirin û mînakên guncaw, ku gelek ferhengên Kurdî vê yekê pêk naynin.

- Di naveroka ferhengê de jî, pêwîst e nîşan bi corên cînavan bê dan, weke mînak, awayê bikaranîna cînavên (kê) û (kî), herwiha cînavên kesayetiye yên xweser (Ez, tu, ew, em, hûn, ew) û cînavên tewandî (Min, te, wî, wê, me, we, wan) yan jî cînavên şanîdanê (vî, vê, wî, wê, ev, ew) û awayê bikaranîna her yek ji wan.

- Diyarkirina pirjimariya gelek navên ku pêwîstî bi naskirina pirjimariya wan heye, weke mînak di rewşa xweser de (Derya: Deryayan), (Pencere: Pencereyan), (Jin: Jinan), wiha jî di tewang û veqetandekê de: (Deryayên fireh), (Pencereyên malê), (Jinên hêja).

- Diyarkirina zayenda navan ku nêzra, mêza yan nêtar in.

- Naskirina navên komel, weke mînak (Kerî: Keriyê pez), (Garan: Garana dewaran).

- Naskirina nav û zanyariyên rasteqîne yên corên mêwe, keskayî, lawir û ajelan, û wergirtina zanyariyên ferhengî û zaniştî yên rasteqîne

derbarê wan navan.

- Naskirina nav û zanyariyên rasteqîne derbarê parzemîn, derya, zerya, çiya, welat, bajar û gundan, ku di ferhengê de têne bicihkirin.
- Wergirtina zanyariyên serke û girîng li ser helbestvan, nivîskar û kesayetiyan navdar, bi taybetî kesayetiyan Kurd, ku di ferhengê de nîşan bi wan tê dan.
- Wergirtina zanyariyan li ser bûyerên dîrokî yên mezin û navdar, bi taybetî yên girêdayî gelê Kurd.
- Yek ji gavên girîng di warê fêrbûnê de, ew e ku ferheng di cihê guncaw de wêneyên rast di şirovekirina gelek peyvan de bikar bîne.
- Yek ji kêşeyên ferhengên Kurdî ew e ku ferheng sazên wan, li gorî pêwîst, bi piraniya peyama fêrbûna ziman bi rêya ferhengê li ber çavan negirtiye, êdî bi dehan zanyariyên zimanî û nezimanî di her rûpelekê de, hatine perawîzkirin, piştguhxiştin û jidestdan, weke mînak forma (nan, nê, nanî), (bê kar) û (bêkar), (ne xweş) û (nexweş).

### **Nirxandina bikaranîna ferhenga Kurdî**

Dûrketina ji ferhengan nexweşiyêke metirsîdar e, wiha jî yek ji pirsgerêk û kêşeyên civaka Kurdî nebûna çand û nerîta bikaranîna ferhengê ye, li ser asta tak û li ser asta malbat, civak, dibistan, peymangeh û zanîngehan. Şagirt û xwendekar li ser girîngiya bikaranîna ferhengan nehatine perwerdekirin. Bi sedema perawîzkirin û piştguhxiştina ferhengan jî, di proseya perwerde û xwendinê de, ast û kwalîteya fêrkirin û perwerdeyê di rewşeke paşktî de ye, bi ser de jî zarok û mezin ji ferhengan dûr dikevin, bi awayekî ku rêjeya zanîna ferhengî û jiberkirina peyvan dike kêmtir ji 10% ji samanê peyvên li ber destan, û kêmtir ji 5% ji samanê ferhengî.

Tiştê balkêş di vî warê de jî, ew e ku piraniya nivîskaran ji bo sazêkirin û dirûstkirina nivîs û berhemên xwe, ji bikaranîna ferhengên giştî yan ên

taybet û pispor, dûr dikevin, yan jî ferhengên hêja û bisûd li ber destên wan peyda nabin, lewma jî nivîs û berhemên wan di gerînerka bikaranîn hejmareke diyarkirî ji peyvan de dimînin, ev yek lawazî û hejariya gencîneya zimanî ya wan berheman nîşan dide, dibe ku rengvedana xemsariya nivîskar di warê bikaranîna ferhengê de nîşan bide.

Li ser asta rojname û ragihandinê jî, eşkere diyar e ku rojname, ragihandin û medyaya Kurdî, di dariştina têkstên nûçe, raport û hevpeyvînan, de, li gorî amarên taybet bi vê lêkolînê ku hatine encamdan û berhevkirin, ne bêhtir ji 5 hezar peyvên Kurdî têne bikaranîn û her di bazneya wan peyvan de digerin, û heman peyvan dûbare dikin, bêyî ku nûbûneke berbiçav bê dîtî û bihîştin. Li kêleka hejariya zimanî û ferhengî, di zimanê ragihandinê de, nexweşiya şaşbikaranîna wî samanê hindik û hejar jî peyda dibe. Gelek nivîskar, rojnamevan û rewşenbîr xwe neçar dibînin ku peyvên biyanî li şûna peyvên Kurdî yên resen bikar bînin, ji ber ku bikaranîna ferhengê ji xwe re nakine kar û bar, yan jî ferhengên li ber destan xwestekên wan kesan heta radeyekê peyda nakin, her di vê derbarê de, bobelata herî mezin ew e ku ferheng bi xwe şaş û çewt be yan jî têkcraya şaştiyan tê de ji ya raştiyan bêhtir be.

### **Rapirsî derbarê bikaranîna ferhenga Kurdî**

Li gorî rapirsiyekê ku li ser nimûneyeke heremekî li ser 100 kesî ji nivîsakar, xwendekar û derçûyên peymangeh û zanîngehan, bi temenên cuda, bi awayê jêrîn li gorî 6 pirsan ku araştayî wan bûn: Temenên beşdarbûyan di wê rapirsiyê de, di navbera 20 – 67 salî de bûn, ji wan 37% kêmtir ji 50 salî ne û yên din bêhtir ji 50 salî ne, ji wan jî 22% li diyasporayê ne, lê 78% ji her çar parçeyên Kurdiştanê ne.

Asta xwendina wan beşdarbûyan jî, bi vî wayê jêrîn e: Di pileya yekem de, li ser asta xwendekar, rewşenbîr û nivîskaran, xwendekarên zanîngehê ne, ku 50.9% ji bikarhênerên ferhengê pêk tînin. Di pileya

duyem de, xwendekarên kêmtir ji qonaxa zanîngehê, ferhenga Kurdî bikar tînin, ku rêjeya 27.7% pêk tînin. Lê Derçûyên zanîngehê yan maîster û doktora jî, di pileya sêyem de tînin, ku rêjeya 14.3% pêk tînin. Di pileya çarem de xwendekar yan derçûyên peymangehan bi rêjeya 7.1% ferhengê bikar tînin.

Derbarê bikaranîna wan kesan ji ferhenga Kurdî re, rêje wiha derket, ku di pileya yekem de, ji rewşenbîr, nivîskar û xwendekarên, kesên ku bi (Erê) bersiv dan, ku ferhenga Kurdî bikar tînin, rêjeya 63.3% pêk tînin. Di pileya duyem de, 29.3% kesên ku kêman çar ferhenga Kurdî bikar tînin. Lê di pileya sêyem de, kesên ku bi (Na) bersiv da, ku ferhenga Kurdî bikar naynin, rêjeya 5.4% pêk tînin. Di pileya çarem de jî, kesên ku bersiv da, ku gelek çar ferhenga Kurdî bikar tînin, rêjeya 1% pêk tînin. Herwiha kesên ku bersiv da, ku hinek çar ferhenga Kurdî bikar tînin, rêjeya 1% pêk tînin.

Her derbarê dîtina sûtê ji bikaranîna ferhenga Kurdî bersiv wiha bûn: Di pileya yekem de, kesên ku bersiv da, ku hinekî sûtê ji bikaranîna ferhenga Kurdî dibînin, rêjeya 57.1% pêk tînin. Di pileya duyem de jî, kesên ku gelekî sûtê ji bikaranîna ferhenga Kurdî dibînin, rêjeya 39.3% pêk tînin. Di pileya sêyem de jî, kesên ku bersiv da ku ti sûtê ji bikaranîna ferhenga Kurdî nabînin, rêjeya 3.6% pêk tînin.

Li ser ku kîjan corî ji ferhengên Kurdî bikar tînin, bersiv wiha bûn: Di pileya yekem de, kesên ku ferhengên duziman bikar tînin, rêjeya 59.8% pêk tînin. Di pileya duyem de, kesên ku hemû corên ferhengan bikar tînin, rêjeya 15.2% pêk tînin. Lê di pileya sêyem de, kesên ku ferhengên yekziman ên Kurdî-Kurdî bikar tînin, rêjeya 14.3% pêk tînin. Bikarhênerên ferhengên pirziman jî, di pileya çarem de ne, ku rêjeya 8.9% pêk tînin. Di pileya pêncem de, kesên ku corine din ji ferhengan bikar tînin, rêjeya 1.8% pêk tînin. Lê kesên ku ferhengên mijaran bikar

tînin, rêjeya 0% pêk tînin, ew jî tê wê wateyê ku ferhengên mijaran gelekî kêr in û gelekî kêr jî têne bikaranîn.

Bersiv li ser pirsê girêdayî hejmara carên bikaranîna ferhenga Kurdî, di jiyana xwe de, wiha derket ku: Di pileya yekem de, kesên ku bi sedên caran ferhenga Kurdî bikar anîne, rêjeya 50% pêk tînin. Di pileya duyem de, kesên ku bi dehên caran ferhenga Kurdî bikar anîne, rêjeya 37.5% pêk tînin. Lê kesên ku 5 heta 20 caran ferhenga Kurdî bikar anîne, di pileya sêyem de ne, ku rêjeya wan 7.1% ye. Di pileya çarem de, kesên ku kêmtir ji 5 caran ferhenga Kurdî bikar anîne, rêjeya 5.4% pêk tînin.

Lê derbarê bicihanîna xwesteka bikarhêner ji têrm û peyvên pêwîst, di ferhenga Kurdî de, bersiv wiha ne: Di pileya yekem de, kesên dibînin ku ferhenga Kurdî heta radeyekê xwesteka wan ji dîtina têrm û peyvên pêwîst, bikar tîne, rêjeya 50.9% pêk tînin. Di pileya duyem de jî, kesên dibînin ku ferhenga Kurdî kêr caran xwesteka wan ji têrm û peyvên pêwîst bicih tîne, rêjeya 24.1% pêk tînin. Di pileya sêyem de jî, kesên dibînin ku ferhenga Kurdî gelekî xwesteka wan bikar tîne, rêjeya 17.9% pêk tînin. Lê kesên dibînin ku ferhenga Kurdî xwesteka wan ji têrm û peyvên pêwîst bicih nayne, rêjeya 7.1% pêk tînin.

### **Gotina dawî**

Pêwîstiya ferhengsaziya Kurdî bi sîstematîkirin û organîzekirineke nûtir heye, bi taybetî ku Zimanê Kurdî, bi hemû şêwezarên xwe, dewlemend, şayan û şayîsteyî pêşketinê ye. Rola ferhengê jî di vî warî de sereke û pêşeng e, ku pêşketin, guhertin, nûjenî, pêşhate û guhertinên peyv û wateyan bişopîne. Wiha jî pêwîstiya ferhengsaziya Kurdî bi analîzkirin û rexnekirineke zaniştî heye, da ku bigihêje asta karekî pêşketî, bisûd û berdard.

---

# **KOPULA.di Ristesaziya Kurdî û Hindo-Ewropî de**

---

■ Barzo Mahmoud

## KURTE

Ev lêkolîn hewldanek e bo naskirin û şîrovekirina kopula wek (morphosyntax) rola xwe di riştesaziya tevahiya zimanên Hindo-Ewropî de ku zimanê Kurdî jî yek jê ye. Hêjayî gotinê ye ku ev babet yek ji mijarên herî giring û hûrbîn e di şîkirina ziman de, nexasim nasnameya morfêma (e) wek kopula Kurdî beramberî kopula zimanê Engilîzî û zimanên Hindo-Ewropî bi giştî wek (is, est, jest, es, ê, ... ) û kopula Farisî wek nêzîktirîn ziman ji Kurdî re. Li ber ronîya kopula van zimanan em dikarin bigihin encameke zanîstî di dawîya lêkolînê de. Ev nivîsar bi wesfdan û şîkirin û berawurdkirin û beramberkirinê rêbaza xwe tê de dihûnê bo ku li ber ronîya aspektên zimanvanî encamên xwe diyar bike.

Peyvên Sereke: pênameya kopula, morforiştesazî, form, zimanê Kurdî, Engilîzî, Fraîsî, Hindo-Ewropî

## ÖZET

Bu makale, Kürtçe ve Hint-Avrupa cümlelerinde sözdizimi rolünde kullanılan bir morfem, bir morfosentaks olarak kopulayı çalışmak ve açıklamak için yapılan bir girişimdir. Bu konunun, özellikle İngilizce kopula ve diğer Hint-Avrupa dillerinin aksine bir Kürtçede Kopula olarak, aynı zamanda Kürtçeye en yakın olan Farsçanın yanı sıra, dil analizinde büyük bir öneme sahip olduğunu söylemek önemlidir. Bu dillerin kopulası ışığında sonuç olarak bilimsel bir sonuca varabiliriz. Bu araştırma, çeşitli yöntemlere bağlı olarak: açıklayıcı, karşıt ve karşılaştırmalı olarak, Kürt kopulasını dilsel açıdan incelemektedir.

Anahtar Sözcükler: Kopulanın tanımı, morfem, şekil, Kürtçede Kopula, İngilizce, Hint-Avrupa.



## ABSTRACT

This paper is an attempt to study and explain the forms of copula as a morphosyntax, a morpheme used in the syntactic role in the Kurdish and Indo-European sentences. It is important to say that this subject has a big significance in the analysis of language, especially the identity of morpheme (e) as a Kurdish copula in contrast with the English copula and other Indo-European languages as well as the Persian language which is the nearest one to Kurdish. In the light of these languages, copula we may reach a scientific result and conclusion at the end. This search, depending on various methods: descriptive, contrastive and comparative, examine the Kurdish copula in the light of linguistic aspects.

Key Words: Definition of copula, morpheme, form, the Kurdish copula, English, Persian, Indo-European.

### 1. DESPÊK

Bi raştî ev babet ji zû ve bala min dikişênê, û gelek wext ji xwendin û lêgerîn û fikir û pûnijîn ji min standiye, herçende min lêkolînek wek pertûk belav kiriye, ku 220 rûpel e, di sala 2012 an li Şamê hate çapkirin, lê ji ber ku gelek kêmasiyên teknîkî têde hebûn, nexasim derbarî belgenûsiya lêkolînê bi şêweya akadîmî, ku gelek çavkanî têde nehatine nivîsandin, yan hatine jibîrkirin. Ji ber wilo dixwazim vî babetî careke di binivîsim ku şêweya xwe ya akadîmî werbigirê. Her di vê mijarê min ev semînar amade kir ku bibe beşek ji lêkolînê.

Inca di piroseya lêgeranê de li pey naskirina nasnameya morfêma (e) ya (Azad zîrek e), hin têbînî di hişê min de druşt bûn, bi awakî ez bikarim li babetekî weha bikolim bo ku bigihim encameke raşt û druşt. Têbîniya min jî pilanek wergirt ku ev lêkolîn pêwîstî bi xwendina heman diyarde di zimanên Hîndo Îranî û zimanên Hîndo Ewropî de heye, ji ber hin hokarên zimanewanî yê hawbeş di babeta kopula de

wek diyardeyekî rîstesazî, ku di baweriya min de rîsta kopular yekemîn core rîste ye di zimanan hemiyan de min weha dît di van xalên jêrî de bigerê:

Wek diyar e kopula di zimanên cîhanê de kêşeyeke kevin e, û herçende guhartin bi salan re bi ser de hatiye, lê dîsa şîrovekirina vê kêşeyê pêwîstî bi zimanên cîhanê heye, nemaze yên ku ji yek malbatê derketine, û yên ku pirtir nêzîkî hev in. Ji ber wilo jî em dibînin ku hawşeweyî û lêkçûn di bêjeya kopula de navbera zimanên cîhanê de heye, bo nimûne em dibînin kopula herî giring ya kesê sêyemê tak e û ev pirtir tê ser zimanê zimanzanên cîhanê, ku şeweyên (is, est, yest, es, e, hê... tad) werdigirê. Her di vê cokê de min xwe berda nav vê mijarê, yan jî eger ne weha bana, min nikarîbû ez bigihim ti encaman. Bo nimûne zimanzanên Kurd weha didîtin ku karê (bûn) jêder e bo bêjeyên (im, î, e, in). Ev bîr û raya han encama têgihştineke mîkanîkî bû li pêka rêzimanê Ingilîzî ye ya ku dibêjê (am, is, are, was, were) formên êsta ne ji karê bijokê (be) re.

Bi raştî ligor xwendina min di zimanewaniya giştî de, ez bi ser hin zanyarî ve bûm ku ev kêşe pêwîstî bi hin lêkolînên nû heye, bi raştî ew lêkolîn nebûn, yan jî vê dawiyê di riya enternêtê de jî hin lêkolînên nû ji zankoyên Ewropî gihane min, û van lêkolînan rê li ber min ronî kir, ta ku bikarim di vê deryayê de melevaniyê bikim, bi ser ku ev mijar pirtir ji bîst salan ve ez tede tajom, lê ez nedigiham encameke ku bi kêmanî ez pê bawer bim, yan jî ez tişteki tede nanivîsim. Ez bihêvî me ku min di vî babetî de hin encamên zaniştî li paş lêkolîneke dirêj dane.

## 2. KOPULA WEK TÊRM

Di ferhenga Ingilîzî û Latînî de şeweya têrma (copula) diyar dibe, belê bi Kurdî min (kopula) jêre danî, bê ku ez vê têrmê bixim bin barê

wergêranê de û peyveke nû jêre bibînim, ji ber ku, bi raya min, têrmên zanyarî taybetiyeke wan heye, û ya baş ew e ku em wan bixin ber têrmên cîhanî de, ango xelkên vê cîhanê hemî yek têrmî bikar bênin, nemaze di warê mijarên zaniştî û globelayzaşin, ku dinya hemî hin bi hin berew yekîtiyê de diçê, lewre em jî di karê xwe de ber bi vê yekîtiyê de diçin. Xala dîtir ev têrm kopula di barê îzafê de (genitive case) ku morfêma (-a) bo mê bikar tê, û (-ê) bo nêr bikar tê. Lewre kopula di barê servekirinê de dibê (kopula Kurdî. Vê kopulê); ango şêweya ferhengî û ya rîstesaziya forma servedanî yan servekirin (izafê) di rênivîsê de bi heman qalibî (koula), wek hev, diyar dibin, lê di axaftinê de guhartineke dengsazî heye. Di alîkî dî ve wek hevalnav dibê (kopular) wek em bêjin (rîsteyên kopular) ango ew rîsteyên ku kopula têde roleke sîntaksî dibîne.

Peyva Kopula <copula> wek zarawe ji zimanê Latînî hatiye, bi wateya ku du tiştên ciyawaz bi hev ve dikê, yan wan bi hev ve girê didê, ango rola likanê û pevvekirina du tiştan dibîne. Ev girêdana han bi gelek şêweyan li gor her zimanekî diyar dibê û di rîsteyên ziman de xwe didê xuyanîkirin, ku du beşên serekî û bîngehî ji rîstê pev ve dikê, beşê pêşî jêre nîhad (subject) dibêjin, û yê duwa guzare (predicate) dibêjin. Bi vî awayî zimanzan wek vê rîsteyê jêre dibêjin rîsteya kopula (The copula model of the basic sentence)

ZIMAN	RISTE
KURDÎ	Esman sayî ye
FARISÎ	Asiman saffî est.
Englîzî	The sky is clear

### 3. ÇARÇÊWEYA TIYORÎ

Di çarçêweya tiyorî de zimannasên Ewropî ji xwe bal kişandine ser

mijara kopula nemaze di despêka sedsala bîstan de wek Meillet (1906) û Benveniste û lêkolînên vê dawiyê (functional-typological studies) yên Stassen û Pustet .

Wikipedia, the free encyclopedia ji torên internêtê yên ku bergehêkî fereh di bin kategoriya copula, Zirokpula, linguistics, Indo-European copula û gelekên dîtir terxan kiriye û mijarên wê yên roja îro û yên dema berê daye ber lêkolînê ku mijarên kopula di zimanên Indo-European languages, ku peyvên bi wataya «to be» ji regê es yê ku bi heman şêwe yan lê nêzîk e di gelek zimanên Hîndo Ewropî de diyar dibe (originating in stem \*es) often sound similar to each other. Due to the high frequency of their use, their inflection retains a considerable degree of similarity in some cases. Wilo, em dibînin «is»a Englîzî ji heman «ist» Elmanî ye, herweha «jest»a Rûsî û «est»a Latînî û «ê»ya Fransî ligel «e»ya Kurdî û Farisî nêzîk e (Thus, for example, the English form is is an apparent cognate of German ist, Latin est and Russian jest, in spite the fact that the Germanic, Italic, and Slavic language groups split at least three thousand years ago . Di vê têvajoyê de Kopula zimanên Romans ku I şêweyekî weha nêzîkî hev tên ku du karên ciyawaz bi wataya karê «bûn»ê diyar dibin, yek ji «sum»a Latînî hatiye û yekî dîtir ji peyva «sto» hatiye her ev mijar di kategoriya (Romance copula) de hatiye şîrovekirin:

A feature of most Romance languages is the coexistence of two different verbs meaning «to be», the main one from the Latin sum, and a secondary one from sto (see Romance copula). The difference is that the former usually refers to essential characteristics, whilst the latter refers to states and situations, e. g. «Bob is old» versus «Bob is well». (Note that the English words just used, «essential» and «state», are also cognate with the Latin roots esse and stare.)

Di zimanê Englîzî de karê ‘To be’, ‘to become’ di stratîjîyeke taybet de bikartên ku bi rola girêdana herdû yekîneyên rîstê û ‘to be’ or ‘to become’ di wêjeya kîlasîkî de her wek kopula dihatin jimartin lê «be» watayeke leksîkî hîlnagirê . Gelek analîz di warê kopula de hatine nivîsîn wek Sapir and Bally ku pêwendiyên zimanî navbera kopoula û guzare destnîşan dîkin. Herweha Martinet jî di lêkolînên xwe de mijara (guzara komplêks ‘ complex predicate) di avakirina rîstê de dide xuyakirin wek heman raman li nik zimanvan Fransî Meillet yê ku (be) wek kopula vala di ruwê watasazî ve dibînin tenê bi erkê girêdanê radibe ku zimanvan Simon Dik (rup 132) û Givón ku weha tê «the copula is no more than a grammatical device» and by Givón who names copular verbs “dummy verbs”, acting as the syntactic head of the verb phrase but carrying a reduced lexical-semantic load (Givón54: 119)» . Lê Benveniste<sup>55</sup> (p. 157) rîstê ya bi kopula «be» rîsteyeke karî têtê jimartin.

#### 4. PÊNASEYA KOPULA

Crystal, David di ferhenga zimanewanî de kopula/copula (n.) weha dide naskirin: «A term used in grammatical description to refer to a linking verb, i.e. a verb which has little independent meaning, and whose main function is to relate other elements of clause structure, especially subject and complement» . Wek çilo di Englîzî de, «the main copular (or copulative) verb is be, e.g. She is a doctor, and the term is often restricted to this verb; but there are many others which have a similar function, e.g. She feels angry, That looks nice, He fell ill» .

Kopula yek ji wan mijarên herî balkêş e di zimanên Hindo-Ewropî de ku ji dema kevin de zimanzan li ser radiwestin û gelek bîr û rayên ciyawaz têtê dane. Ev jî ji ber ew mijûmorana ku ev bêje di nav de

dijî. Kopula bêjeyek e, yan jî rêjeyeke bêhawta ye, bi erkê girêdan û bestinê radibê di rîsta bêkar a navî de, herweha dikevê nav tevina rêjeya karî de. Ev rêje jêre kopula (copula), (bestik/bestêner) dibêjin. Hebûna kopula pirtir di zimanên Hindo-Ewropî de peyda dibê, û hawşeweyî navbera bêjeyên kopula de heye, herçende ew ziman di hin rûçikan de ciyawaz in, wek:

Kurdî: Azad mêr e.

Farisî: Azad Mêrd est.

Ingilîzî: Azad is a man.

Bi ser ku mijara kopula baş wext ji lêkolînê standiye, lê ta niha jî ciyawazî di bîr û rayan de navbera zimanzanan de heye, sebarek nasname û ketigorî û bere ji alîkî ve, û hebûn û nebûna wê ji alîkî dîtir ve. Avahiya kopula bûye cihê balkêşiya lêkolîn û berhemên zimanzanên wek Meillet (1906) û Benveniste (1950) û Verhaar (1967/72) û Declerck (1988) and Hengeveld (1992), û Stassen (1997) û gelekên dîtir.

Yek ji diyaredeyên herî giring û balkêş di zimanên Hindo-Ewropî (Indo-European) de kêşeya kopula ye, ku gelek lêkolîn û dîtinên ciyawaz ji aliyê zimanzanên cîhanê de di çiyetiya vê forma zimanî de diyar dibin. Berî ku em li ser kopula Kurdî rawestin, emê wate û erk û formên wê di ziman de vewejêrin, û emê vegerin ser heman diyarde di zimanê Hindo-Ewropî de, ku pêşî emê riya xwe bi hin zimanên Cermanî û Latînî de bixin, paşê emê berê xwe bidin zimanên Hindo-Îranî, yê kevin û nû, nemaze yê Farisî ku nêzîkî zimanê Kurdî ye. Mebesta me jî ew e ku em di riya van zimanan de bikarin hin rehniyê bavêjin ser diyardeya kopula, ya ku di nav van zimanan hemiyan de hevbeş e.

Zimanzanan kopula bi Ingilîzî (verb to be) bi awakî lasayî dane nasîn ku wek navgîniyek rikinên avahiya rîstê bi hev ve dikê, nemaze nîhad û guzare yan palpişt û paldiraw (subject and complement). Hin zimanzan bêjeya kopula bi tena xwe bêwate (meaningless) dibînin. Lewre jî hin

zimannasan hewqas pûte pê nedane. Xanim Dr Pustet di lêkolîna xwe de xwestiye vê valahiyê dagirê. Bo ku karekî têde bikê, xwe avêtiye nav kêşeyên vê mijarê bi pênaseya pejirandî daye ser riya lêkolînê. Xanimê şîrovekirinek bi şeweya rêzimanî ji sed û şêst zimanî re pêşkêş kiriye, ku piraniya malbatên ziman daye ber xwe. Wê jî daye xuya kirin ku hin ziman bi yek kopula ne (a single copula), hinên dîtir bi çendeka ne, û hin jî yekcar têde peyda nabê.

Zimanzan di pênase û çiyetiya vê morfêmê de ciyawaz in, hin wê wek peyv didin naskirin:

1) Di zimanevanî de kopula bêjeyek e nîhad û guzare (tewawkerê nîhad) bi hev ve girê didê. herçende ev bêje bi xwe ne rûdan û ne jî bar û merc hildigirê, belê guzare li gel nîhad hawta dikê. ((In linguistics, a copula is a word used to link the subject of a sentence with a predicate (a subject complement or an adverbial) . Although it might not itself express an action or condition, it serves to equate (or associate) the subject with the predicate)).

2) Hin zimanzanên dîtir weha dibînin ku ev kopula di hin ziman de di şeweyê kar de nayê, ango kopula nabê di hemî zimanan de wek kar derbikevê, nekû timî weha ye, carina wek kar, yan pelekêr tê jimartin. (A copula is sometimes (though not always) a verb or a verb-like part of speech) .

3) Serçaweyeke dîtir dibêjê: kopula karekî teneper e ku nîhad bi firêza nav ve, yan bi hevalnav ve, yan bi pêkhênerekî dîtirî guzare ve girê didê . Herweha hin karên dîtir jî dikevin ber heman çêşin û erk de, bo nimûne di korsên seretayî yên perwerdeya Ingilîzî de jêre dibêjin karê lianbar (linking verbs) ku «to be» kopula serekî ye di nav hin karên dîtirî hevalçêşin de, wek: «to be», «to become», «to get», «to feel», and «to seem» .

## The book is on the table.

### The weather seems good.

4) Kopula ew peyv e<sup>ç</sup> ya ku saloxdanê navbera nîhad û guzare de druşt dikê <sup>ç</sup> û wan bi hev ve dikê. Di gelek zimanan de kopula nifşekî taybetî ye ji kar<sup>ç</sup> hincar jêre (copulative verb) yan (linking verb) tê gotin<sup>ç</sup> ji ber ku kopula û karên wek wî saloxdana rûdan nakin<sup>ç</sup> û dervî ciyawaziya têper û têneper têne şîkirin. Kopula herî diyar di zimanên Hindo-Ewropî de karê (be) ye. Inca kopula rûdan wesf nakê<sup>ç</sup> lewre ev bêje dervî kêşeya ciyakerê têper û têneper tê şîrovekirin<sup>ç</sup> wekçawe bi Ingilîzî weha tê gotin: «Because copulas do not describe actions being performed<sup>ç</sup> they are usually analysed outside the transitive/intransitive distinction. The most basic copula in English is to be; there are others (remain<sup>ç</sup> seem<sup>ç</sup> grow<sup>ç</sup> become<sup>ç</sup> etc.)».

Di hin zimanan de<sup>ç</sup> wek zimanên Samî û Rûsî û Sînî û ta Sensikrîtî jî<sup>ç</sup> kopula di rîstê de peyda nabe<sup>ç</sup> nemaze<sup>ç</sup> di rîsta katê êsta de. Di van zimanan de weha bi hebûna du navan<sup>ç</sup> yan nav wek nîhad<sup>ç</sup> û hevalnav wek guzare rîste ava dibê. Ev rîste-avahî jêre zîrokopula dibêjin. Bi awakî dîtir jî kopula wek hawşêweya «to be»ya Ingilîzî di hin ziman de dîsa peyda nabe<sup>ç</sup> ku kopula bi şêweya gîrekî (affix) diyar dibe<sup>ç</sup> nemaze di katê êsta de<sup>ç</sup> wek zimanê Kurdî û Farisî ku kopula kesê yekem û duwem û sêyemê ko core gîrekên kesane û jimare xwe didin xuyakirin<sup>ç</sup> bo nimûne «Ez başim» lê belê di Kurdî de ev kotahiyên kesane di zarê Kurmanciya Latînî de serbixwe têne nivîsîn<sup>ç</sup> ku ev jî di rêzimana Celadet Bedirxan de hatiye çespanandin. Di beşê kopula Kurdî de<sup>ç</sup> emê li ser vê kêşeyê bi ferehî rawestî.



## 5. FORMÊN KOPULA DÎ ZIMANÊN HÎNDO EWRUPÎ DE

Karê (verb to be) di dema nihokê de (in the present tense) çend forman werdigire u taybetiyeke zimanvanî ye di piraniya zimanên Hindo Ewropî de. Eger em formên bêjeya kopula zimanên Hindo-Ewropî bixin bin neynika guhartina zimanvanî di çarçoveya cografî û dîrokî de, emê bibînin ku kopula Kurdî bi taybetî forma (e) ya rîsta (Hevind merd e) ji hemî aliyên zimanî ve wek ya Hindo-Ewropî xwe nîşan dikê.

Di xiştexaneyê jêrî de karê (be) di katê êsta de û di barê ektîv de wek bîjoktirîn form tê jimartin, ku bi her kesekî ji kesên cênav re xwe bi awakî taybetî didê xuyakirin. Inca formên verb to be di zimanên Hindo-Ewropî de weha diyar dibê ku ew jî di vê cedwela jêrî de berçav dibin :

	Li gel cênavê kesê tak			Li gel cênavê kesê ko			
jêder	1	2	3	1	2	3	
Latînî	esse	sum	Es	Est	sumus estis	sunt	
Italîessere	sono	Sei	È	siamo	siete	sono	
Frensî	être						
suis Es	Est	sommes	êtes	sont			
Espanî	ser	soy	eres	Es	somos sois	son	
Ingilîzî	be	am	are	Is	are	are	
Elmanî	sein	bin	bišt	İst	sind	seid	sind
Dutch	zijn	ben	ben(t)	Is	zijn	zijn	zijn
Islandîk	vera	er	ert	Er	erum	eruð	eru
Greek	eînai	eimí	eî	Estí	esmén	esté	eisí
Greek	none	íme	íse	Íne	ímašte	íšte	íne
Albania	none	jam	je	Asht	jemi	jeni	janë
Polish	być						
jestem	jestes	Jest	jestesmy	jestescie	są		

Bulgarî	biti						
sămsi	E	sme	ste	să			
Latvian	būt						
esmu	esi	Îr	esam	esat	ir		
Farisî	budan						
haştam	hashti	Haşt	haştim	haştid	haştand		
Hindî	hona						
hoon	hai	Hai	hain	ho	hain		
Kurdî	bûn	im	î	E	in/în	in	in

## 5. KOPULA ZIMANÊ ENGLÎZÎ

Zimanzanên Ingilîzî dema dibêjin (am, is, ....tad.) wek formên jêdera (be) dibînin, û di risteyên kopular de bikar tînin, vê rayê, yan vê destûrê li ser ravekirineke watesazî (sîmantîkî) ava dikin, ku eva han di lêkolînên zanayên nû hate xuyakirin ku ev morfêmên hanê taybetiyeke wanî dîrokî heye û gelek guhartin bi ser de hatiye. Bo nimûne, emê li ser çend xalên zimanvanî navbera Ingilîz û Kurdî de rawestin. Pirsê xwe tavêjê meydanê, ew jî ew e: gelo (am, is, are) kar in yan ne? Bersiva vê pirsê weha tê:

Xala yekem:

Morfêmên (am, is, are) di risteya Ingilîzî de, wek karên (model/helping verb) yên Ingilîzî dikarin cihê xwe biguhêzin, û wek peyvên dîtir qalibê xwe, di ziman de biparêzin, û rola xwe bi şeweyekî serbixwe bibînin, wek:

- A. He is a tall man, isn't he?
- B. Is he a tall man?
- C. No, he is not a tall man.

Strekerê ristê bêjeyên (am, is, are, was, were) di Ingilîzî de qalib û

reftarên karên (auxiliary verbs) distênin wek em bêjin:

We will go to Kurdiştan.

Will you go to Kurdiştan?

You should study.

Should you study?

Wilo jî (am, is, are ... tad.) dikarin bi heman reftar rabin, wek:

You are a student, aren't you?

Are you a student?.

No, I am not.

Yes, I am.

Ev pirose hiştiye ku hin zimanzanên Ingilîzî morfêmên (am, is, are) bixin nav berê (kar – verbs) de, Mebešta min jî her ew bû ku ez bidim xuya kirin ku ev morfêm di zimanê Ingilîzî de hin siruşt û rewišta karên alîkar hildigirin wek (must, will, should, would, may, might, can, could).

Herweha jî piroseya gerdankirinê dibê hoyek di piştgirîkirina xala karîbûna van morfêmên (am, is, are), ku ji katê êšta dikevê katê rabirdû de bi guhartina şeweyê peyvê, wek:

Êšta/present	rabirdû/past
am	was
is	was
are	were

Lê dîsa ji ber hoyên sîntaksî hin zanayên Ewropî (am, is, are) wek kar nabînin, wekçawa di lêkolîna zimanzan, Misha Becker de kopula (be) wek bêjeyeke negerdanker didê xuyakirin, ango nayê gerdankirin, inca jêre (the uninflected copula (be)) dibêjin, lê kopulayên (is, am, are, was, were) têne gerdankirin, lewre jî jêre (the inflected copula) dibêjin. Ev herdû core kopula: gerdanker û negerdanker di warê sîntaksî de ji hev ciyawaz in (syntactically different entities). Li ser vê mijarê

Misha Becker di lêkolîna xwe de bi navê (is isn't be) dabû xuyakirin ku kopula negerdanker di aliyê sîntaksî de ji berê kar tê jimartin, belê kopula gerdanker bi ser infliksînan de diçê, ji berê kar nayê jimartin, ango bêjeya (be)ya Ingilîzî kar e, lê (is) ne kar e.

### 5.1. Birrîna Kopula (copula deletion)

Herçende zimanê Ingilîzî zimanekî kopular e, lê hin car û di hin rîsteyan de kopula dernakevê, herçend wateya wê tede heye, wek: «The higher, the better», û hin barên pirsyarî de wek «You from out of town?» Herweha di rîsteyên sersûrmayî de wek «You the man!». Di Ingilîziya Efrîqî de jî hin car di axaftinê de wa heye ku kopula bikar neyê, inca dibêjin: «You crazy!» or «She my sister». «Where you at?» and «Who she?» ango «You are crazy!» or «She is my sister». «Where are you at?» and «Who is she?» Ev diyardeya han di zimanê Kurdî de jî peyda dibê wek em bêjin: ka ew? Yan Kanî ew/ ku rişte bi xwe kurtkirina (ka ye ew?), û (kanî ew li kû ye?) derbirrînên wusa di hemî zimanan de hene, û ev diyarde awarte cihê diyardeya giştî nagirê, lewre ev kêşe nabê cihê gelşê û matbûnê, û tiştêkî li paş û pêş naxê.

Herwqeha birrîna kopula di sernavên gotarên rojnameyan de jî tiştêkî normal e, hincar kopula di nivîsînê de tê avêtin ji ber ku bêjeyên kurt nayên nivîsandin da ku rê ji peyvên mezin re fereh bibê, bo nimûne di rojnameyên Kurdî de û di televîzyonan de didanîn «Na bo Sedam» ango «Na bo Sedam e». Weha jî di Ingilîzî de «Gulf coast in ruins» tê nivîsîn li şûna «Gulf coast is in ruins».

The absence of an overt copula, especially when meaning “is” or “are.” Yek ji taybetiyên Ingilîziya Emrîkiya Efrîqî (African American Vernacular English) (AAVE) û hindek ji Ingilîziya Emrîkî ya başûr (Southern American English) di axaftina xelkên spîrû çîna karker

(working-class) de ew e ku forma (be) di hin risteyên xwe de bikar nayênin di dema ku hebûna vî karî di zimanê standard pêwîst e bo nimûne, risteyên wek (He working), li şûna ku bêjê (He is working) bi wateya ku niha kar dikê “He is working right now.” Zimanzan ji vê yekê re dibêjin bikaranîna zîro wek kopula zîro nav lêdikin, lê eger bi hûrbînî lê temaşe bikin, gerek em jêr bêjin alîkarên zîro (zero auxiliary). Ji heştê ta not ji sedî ji axêverên Ingilîziya Efrîqî formên kopula (is, are) yê katê êsta de di axaftina xwe de nayênin ser ziman, ango is û are jê tavêjin. Di welatê Emrîka de, kopula zîro di risteyên ku guzare nav bê (He a man) ango (He is a man) kêmtir e ji risteyên ku guzare hevalnav e (He happy) ango (he is happy).

## 6. KOPULA ZĪMANÊ KURDÎ

Berî ku em dest bi lêkolîna xwe bikin, dixwazim xwendevanan bi naverok û mebesta mijara lêkolînê bi naskirin bidim. Babeta min weke hercar babeteke zimanvanî ye, di çend bêjeyên herî giring di rîstesaziya zimanê Kurdî de dikolê, û hewl didê roniyê di çend aştan de bavêjê ser van morfêman, van bêjeyên ku di dawîya van risteyên jêrî de tîn, û risteyên Kurdî bi du girûpên ciyawaz dabeş dibin. Emê van bêjeyên ku bi rola rîstesazî radibin bi rengê reşî tarî diyar bikin. Ezê gurzek nimûne ji risteyên ku dawî bi paşkokan tîn li ber xwendevanan danim ji ber ku paşkok û kopula ne peyvîne ferhengî ne, lêbelê wek van bêjeyan di bunyada rîsta Kurdî de diyar dibin, lewre di zimanewanî de ji wan re morfêmên sîntaksî (syntactic morphemes) tê gotin. Tiştê balkêş ku helbesteke Cegerxwîn heme bêje bi tevayî di avahiya kopula de tê, ku ew jî ev e (bêjeyên reşê tarî kopula û paşkok in):

**Welatê Kurda tev xêr û bêr e**

**Hemî maden e, tev zîv û zêr e**

**Lê çi bikim îro maye j'xelkê re.**

Welatê Kurdan hemî çîmen e<sup>ç</sup>  
 Egîd û şêr û piling tê hene<sup>ç</sup>  
 Hemî heval û pismamên me ne.

Pêş li dinyê du dewlet hebûn<sup>ç</sup>  
 Yek jê Faris bû<sup>ç</sup> ew em bi xwe bûn<sup>ç</sup>  
 Tirk û tazî û ecem tune bûn.

Em ne Tazî ne<sup>ç</sup> ne Tirk û Rom in<sup>ç</sup>  
 Xwedan paşan e<sup>ç</sup> leşker û kom in.  
 Îro wêran in<sup>ç</sup> bin destê bûm in.

Xelkê em kuştin avêtin çeman<sup>ç</sup>  
 Begler û paşa di nav me neman<sup>ç</sup>  
 Koma miletan eman û eman.

Koma miletan ma qey tu ker î<sup>ç</sup>  
 Çavê te kor e tû l' me nanerî<sup>ç</sup>  
 Yaxûd dijmin î<sup>ç</sup> tu j me nagerî.

Koma miletan hûn polperest in<sup>ç</sup>  
 Derheqê me de hûn qewî sist in<sup>ç</sup>  
 Dijmin bi dostî em îro xistin.

Gunhê me çi ye bo çi dey nakî<sup>ç</sup>  
 Pirsê ji halê me Kurdan nakî<sup>ç</sup>  
 Em kêm ketine tû me ranakî.

Ev ne huryet e<sup>ç</sup> kotek û zor e<sup>ç</sup>  
 Lê hun dizanin dinya bi dor e<sup>ç</sup>

**Çerxek li jêr e çerxek li jor e.  
Xewa me nayê, em qet ranazin,  
Em ji we dikin hêvî û gazin,  
Em jî heqê xwe her dem dixwazin.**

**Te em xapandin civata rengîn,  
Ji destê te em giş bûne xemgîn,  
Ne ez bi tenê tev bûn Cegerxwîn.**

Lêkolîn di kopula Kurdî de pêwîstî bi ger û vepexartinê heye nemaze di zimanên dîtir de, yên ku bi Kurdî re xuh û heval in, kevin û nû. Berî ku em bikevin nav kopula Kurdî de, emê li kopula Hindo-Ewropî û Hindo-Îranî vegerin ka ev kopula di zimanên kevin de çi rêje wergirtibû, û çilo ev bêje di van zimanan de bikar dihat, û çi guhartin bi ser de hat ta ku gihaşte formê xweyî dawî, wek forma kopula Ingilîzî ya ku îro çend rêje jêre hene: (kopula – verb to be: am, is, are, was, were).

Bi dû de, emê werin ser kopula û paşkokên rîsta Kurdî, û emê bibînin ka çi form û terz wergirtine, û çilo bikartên, û çi rolê di rîstê de diştênin. Ji ber wilo jî, gelek pirs di hişê min de çûn û hatin û ez bi hêvî me ku bikarim bersiva wan bi zaniştî û bawerî bidim. Ezê pirsên xwe jî di vî babetî de li ber xwendevanan danim, bi hêviya ku em pevra di vî lêkolînê de li bersiva bigerin.

Çilo girêdan di navbera yekeyên destewaje de bi morfêmên îzafê saz dibê, wilo jî girêdan navbera nîhad û guzare wek du rexên rîstê bi riya paşkokan saz dibê, ku kopula yek ji van paşkoka ye, belê taybetiyê wê heye, lewre navê wê heye, her ew jî morfêma (e) ye, ya rîsta (Azad zîrek e) ku ji coreyên morfosîntaksî ye, ango ev morfêm tenê di bunyada (structure) rîstê de diyar dibê ku bi erkekî sîntaksî giring radibê, her ew jî guzare bi nîhad ve girê didê. Ev girêdan bi xwe birryardan e, û bi riya morfêma e rîsteya Kurdî tewaw dibê, û watadar

dibê. Ev tewawkirin jêre isnad tê gotin.

Morfêma (e) ya ku di risteyên navî de diyar dibe wek (Azad merd e). (Maşt spî ye) dikevê ber celebê morfêmên ristesazî de (morphosyntax) ango ev morfêm girêdana merdbûnê bi Azad ve dike, herweha spîbûnê bi maşt ve. Wilo jî ristesazî destûrên xwe peyrew dike wek hawtakirin (agreement) navbera nîhad û guzare (subject and predicate) . Hin karên dîtir bi ser ku di erkdariya girêdanê de wek hev in lê di wata de ciyawaz in wek

**Ev keçik xweşik e**

**Ev keçik xweşik bûye**

Inca «bûye» ji karên kopular tê jimartin wek ku di zimanê Englîzî de  
She is a dancer/unmarried/21 years of age,

He has become very handsome.

Têrma kopula tenê çêl karê «bûn» dike di Kurdî de, wilo jî çêl karê «be» dike di Englîzî de. Lê karên wek (be, become, seem, get, and some others) bi erkê be radibin.

### **6.1 Kopula Kurdî û Englîzî**

Eger em li kopula zimanê Kurdî di rûwê morfolojî û sîntaksî binerin, û yasayên rêziman danin ber xwe, kopula Kurdî berevajiya Ingilîzî tê, ji ber ku kopula Kurdî ya katê êsta ne ew şeweya morfolojî ya katê rabirdû ye, wilo jî ciyawazî di rola sîntaksî de jî diyar dibê, ango morfêmên (im, î, e, in/in) yên katê êsta ne tên gerdankirin ku em bêjin reftarê kar distênê, û ne jî pêwendiyên xwe bi morfêma (bûn) re hene, weha jî ciyawazî di gelek aliyên sîntaksî de navbera wan de heye, herçend



herdû kopula (e)ya êsta û (bû)ya rabirdû di hin bar de wek hev tên, nemaze di rûwê watasazî de ku kat ji êsta dixê rabirdû de, wek:

**Ew kî ye? Ew Azad e**

**Ew kî bû? Ew Azad bû.**

**Lê dema em dibêjin:**

**Azad mandû ye**

**Azad mandû bû**

**Azad mandû dibê**

**Azad bû mamošta**

**Azad dibê mamošta**

**Azad wê bibê mamošta**

Weha diyar dibê ku rişte bi kopula e/ye wataya rûdanê têde peyda nabê, lêbelê di risteyên ku bi (bû) hatine druştkirin wataya rûdanê di wan de diyar e, ji ber ku peyva (bû) her kar e, lêbelê kopula (e) nakevê ber wateya kar de. Inca em dikarin bêjin ku morfêma (bû) ji celebê kar-tayp e (V-type copula), lê morfêma e û yên dîtir ji celebê rês-tayp e (Infl-type copule). Inca ez morfêmên kopula ji hemî aliyên rêzimanî ve dixwazim bixim ber lêkolîn û şîkirinê de.

Sebaret barê nerênî (with respect to negation)

Yek ji durvên yeksaniyê navbera morfêmên Kurdî û Ingilîzî ew e çilo inflekşin nîşana nerênî werdigirin, wilo jî di Kurdî de ev bar heye, wek:

Ingilîzî: (isn't, aren't, cannot, isn't, aren't, weren't, wasn't...).

**Kurdî: (nîm, nît/niyît, niye, nînin )**

## **6.2 Ciyawazî navbera Ingilîzî û Kurdî de**

Ciyawazî navbera morfêmên Ingilîzî (am, is, are) û morfêmên Kurdî de ew e, yên Ingilîzî wek karê normal tên gerdankirin navbera rêjeya êsta û rabirdû ku (am, is) dibin (was), û (are) dibê (were), û ev ruwalet

û durv dihêlê ku zimanzan van morfêman bi karîtî (ango wek kar) bigirin, lêbelê beramberî vê yekê morfêmên Kurdî (im/m, î, e, in/în, in .... ) nayên gerdankirin ango nakevin ber piroseya conjugation de û her û her di yek rêjeyê de tên, û di herdû risteyan de derdikevin ji bilî «e/ye» ku tenê di rîsta kopular de derdikevê, belê yên dîtir dibin paşkok û bi dawiya karên dema êsta û dema rabirdû û dema paşerojê. Lê yên Ingilîzî demên lêkdayî ava dikin û dibine sedema guhatina dem ji ranebirdû ta rabirdû wek:

### Present Past

I am good I was good

I am waiting ... I was waiting

We are having breakfast We were having breakfast

Dema em li kopula Hindo-Ewropî dinerin ka çî bi serê wê hatiye û hinde (ewende) bîjok bûye, û ketiye bin kartêkirina gelek astên zimanî de ku form û rêjeya wê taybetiyeke takane wergirtiye; ji ber vê yekê nabê, e soranîm vê bêjeya ku pirtir bi ser hêza karî de diçê, em wê li gor pîvan û siruştî karê normal bibînin. Helbet ev yek ne tenê di Kurdî de lê belê li nik hemî zimanên ku kopula wek bêje tede peyda dibê, nemaze zimanên Hindo-Ewropî.

1) Morfêma (e/ye) ya rîsta (Azad merd e) bêgoman kopula Kurdî ye, ya ku bo kesê sêyemê tak bikar tê. Ev kopula wa ji min ve diyar e ku heman kopula Farisî (est û heşt) e. Ya dîtir jî ew e: çawa ku di Farisî de dibê ku em paşkokan wek kopula bê (heşt) bikar bînin, û est tenê bo kesê sêyemê tak bikar tê, wilo jî di Kurdî de heye ku paşkok wek kopula bikar tên, û (e/ye) bo kesê sêyemê tak bikar tê.

2) Morfêmên rîsta navî (im/me/m, î/yî, e, in/în /ne/n) bi du rolan radibin: (e/ye) wek kopula rola xwe di rîsta navî de dibîne, ku herdû

binçîneyên ristê bi serhev ve dikê, û birryarê navbera herdûkan de didê, ku ristê pê tewaw dibê, û wateya xwe bi tewawî didê.

im/me	bo kesê yekem	Ez Serbest im	Ez gundî me
î/yî	bo kesê duwem	Tu Serbest î	Tu gundî yî
e/ye	bo kesê sêyem	Ew Serbest e	Ew gundî ye
in/ne	bo kesê yekem û duwem û sêyemê ko:		

Em Kurd in (em Kurd î)	Hûn Kurd in	Ew Kurd in
Em tî ne	Hûn tî ne	Ew tî ne

3) Morfêmên kopular di rênivîsa Latînî de cuda têne nivîsîn, lê di rênivîsa alîfbaya Arebî likaw tê nivîsîn.

### 6.3 Risteya Kopular di zimanê Farisî de

Eger em pirtûka zimanê Farisî vekin, emê bibîbin ku her zimanzanên Faris rîsta bikopula wek ristêke navî dibînin, herçende karê «est» jî her tede ye, wekçawe di pirtûka zimanê Farisî ya nivîser Hisên Endîşe ku her bi zimanê Farisî ye. Min jî ev têkişta xwarê ji rûpelê 18an wergirt, ew jî ev e:

هر جمله ای که در آن فعل عام بکار برود جمله ی اسمیه (اسنادی) است.  
در جمله ی اسمیه وجود سه قسمت ضروری است:  
ارکان جمله ی اسمیه:

1. مسند

2. مسند الیه

3. رابط

ارکان جمله ی فعلیه:

1. فاعل

2. فعل

### Wergerandina têkişta li jor hatiye ev e:

Ristê weha li ser du coran tê dabeşkirin:

Ew risteya ku bi karê «am» ango ya karê wek «estîn» û «bûden» û «şûden» û «gîştên» tede bikar tê, di nav rîsta navî yan isnadî de tê jimartin.

Bingehên rîsta navî ev in:

1. nîhad
2. guzare
3. kopyûle

Bingehên rîsta karî ev in:

1. kara
2. kar

Dektor Mihemed Eltûncî di pirtûka xwe de (Zimanê Farisî û Rêzimana wê), rîsteya Farisî li ser du coran dabeş dikê: rîsteya navî û rîsteya karî. Pişt re dibêjê: Herçende em jêre rîsta navî dibêjin, lê ev rîste bi kopula «est» dawî pêtê, ya ku ji nîfşê karên alîkar tê jimartin, û ev kopula wek karê «is»a Ingilîzî tê, û rola wê jî ew e herdû binçîneyên rîstê bi hev ve girê bidê, û wateya «bûnê» bidê. Ji ber vê yekê, ew rîsteya ku kopula têde bi tena xwe beşdar e, bi tewawî nakevê ber corê rîstên navî de, ne wek rîsta Erebi ye, ji ber ku kopula bi xwe di zimanê Erebi de her nîne.

Înca emê rîsta navî ya bingehîn (kernel sentence) ya zimanê Farisî li gel rîsta zimanê Kurdî ku bi van şeweyan diyar dibê:

Farisî

Mêrd Azad est.

Asman saf est

Tte'am ber mêz est.

Kîtab înce est.

Xuda `adil est

Daniş gencî est

Kurdî

mêr Azad e

Esman sayî ye

xwarin li ser mêzê ye

pirtûk li vir e

Xudê dadmend e

Zanîn gencîne ye.

Tehran paytextê Îran est. Tehran paytexta Îranê ye.

Ji xwe wa diyar e ku forma kopula Kurdî (e) yan (ye) cihê heman kopula Farisî digirê ku ew (est) e. Lê wek agahiyên min ji nava Îranê ku di zimanê axaftinê de gelek kes bi şeweya Kurdî derdixin ji ber ku siviktir e.

## 9. Encam:

1) Li dawiya lêkolînê û piştî ku min li formên vî karî di gelek zimanên Hindo-Ewropî yên kevin û nû de xwend û min baş xwe têde mandû kir, ez gihame wê rayê ku morfêmên (im, î, e, in, in) di rîsta Kurdî de bi şeweyekî ji şeweyan bi heman erk û rola rêjeya karê «esten» û «hesten»ê Farisî radibin, wek çawa formên karê (am, is, are) yê Ingilîzî bi heman erkî di rîsta kopular de radibin. Lêbelê guhartinek di şikirina morfolojî de navbera kopula Kurdî û kopula Ingilîzî de heye. Ew jî ew e ku du têge û du zaraweyên rêzimanî tene holê: kopula û paşkok. Lê di Ingilîzî de her yek bi yek zarawe û bi yek têge xwe diyar dikê ew jî formên karê (verb to be) ye, yê ku bi erkên corawcor radibê bi awakî cuda ye ji zimanê Kurdî. Helbet ew kesê rêzimanê Ingilîzî dizanê, vê raştîyê nas dikê.

2) Forma «e» û «ye» wek binke ye beramberî (is, est, ye, es, e, ... tad.) yên Hindo-Ewropî tên. Ya dîtir jî çilo ev rêje/form di Hindo-Ewropî de bîjok e û taybetiyeke wê heye, ku ji hemî karên dîtir cuda ye, wilo jî di Kurdî de heman durv û reftar û wate wergirtiye.

3) Çilo rûdan di Formên kopula Hindo-Ewropî de nîne, wilo jî di yên Kurdî de nîne. Kat bi xwe di vê rîsta kopular de ne katekî normal e, ango ne tenê êsta tede heye, lêbelê hincar ji sînorên kat derbas dibê ku êsta û rabidrdû û ranebirdû û paşeroj hemî pevra tede hene wek ku bi Erebi katê rehayî (zemen muttleq) jêre dibêjin.

4) Hawşêweyî navbera piraniya zimanan de xuya ye. Eger mirov li şêweya van rêje bêjeyan dinerê û guh didê dengên wan wa diyar dibê ku rêjeyên kopula zimanê Kurdî ji hemî zimanên dîtir siviktir û xweştir e.

## 10. Çavkanî (References)

### 10.1 Çavkaniyên bi Engilîzî

1. André Martinet, 1985, *Syntaxe générale*, Paris, Armand Colin.
2. Antoine Meillet, 1906, *La phrase nominale en indo-européen*, Mémoires de la Société de
3. Antoine Meillet, 1964 [1934], *Introduction à l'étude comparative des langues Indoeuropéennes*, Paris, Hachette
4. Bas Aarts and April McMahon (2006) *The Handbook of English Linguistics* by Blackwell Publishing Ltd, 9600 Garsington Road, Oxford OX4 2DQ, UK
5. Charles Bally, 1920 [1932], *Copule zéro et faits connexes*, Bulletin de la Société de
6. Crystal, David, 1941– *A dictionary of linguistics and phonetics* / David Crystal. – 6th ed. p. cm. [www.blackwellpublishing.com](http://www.blackwellpublishing.com)
7. Crystal, David. 1980. *A first dictionary of linguistics and phonetics*. Boulder, CO: Westview
8. Edward Sapir, 1992 [1921], *Le langage*, Paris, Payot.
9. Emile Benveniste 1966, 'Être' et 'avoir' dans leurs fonctions linguistiques, *Problèmes de*
10. Evangelia Adamou, Denis Costauoc, *Connective Constructions in the World's Languages: A Functionalist Approach*, HAL Id: hal-00674209 <https://hal.archives-ouvertes.fr/hal-00674209> Submitted on 26 Feb 2012
11. George Yule the (2006) *Study of the Language*, Cambridge University Press
12. Gideon Goldenberg, «On Verbal Structure and the Hebrew Verb», in: idem, *Studies in Semitic*

13. Hadumod Bussmann (1996): Routledge Dictionary of Language and Linguistics, translated and edited by Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, London and Newyork.
14. Leon Stassen, 1997, Intransitive Predication, Oxford, Clarendon Press / Leon Stassen, 2008, Zero copulas for predicate nominals, in Martin Haspelmath, Matthew
15. Dryer, David Gil & Bernard Comrie (eds.), The World Atlas of Language structures on line (Wals), Feature 120, Munchen, Max Planck Digital Library, <http://wals.info/feature/120>
16. Linguistique de Paris 14, p. 126-.
17. Linguistique G n rale 1, Paris, Gallimard, p. 187207-.
18. Misha Becker Assistant Professor Linguistics Department University of North Carolina
19. Muneer Al.Be>lbek  (1980) Qam s Almewrid, Engl z -Areb , Beyr t, Libnan
20. Pu tet, Regina (2005). Copulas: Universals in the Categorization of the Lexicon. Oxford studies in typology and linguistic theory. Oxford University Press. ISBN 07-928180-19-.[page needed
21. Quirk, R. et al. 1985. A comprehensive grammar of the English language. London and New York.
22. Regina Pu tet, 2003, Copulas. Universals in the Categorization of the Lexicon, Oxford, Oxford University Press.
23. Richards (eds), Linguistic Categories: Auxiliaries and Related Puzzles, Dordrecht, Reidel, p. 121143-.
24. Simon Dik, 1983, Auxiliary and copula be in a functional grammar of English, in F. Heny & B.
25. Talmy Giv n, 2001, Syntax I, Am sterdam, John Benjamins.
- 10.2 Internet Referances
26. Wikipedia, COPULA
27. Wikipedia, COPULA (Linguistics)

28. Wikipedia, COPULA(LINGUISTICS)
29. Wikipedia, kategoriya COPULA (Linguistics)
30. Wikipedia, linking verb
31. Wikipedia, retrieved from «[http://en.wikipedia.org/wiki/Romance\\_copula](http://en.wikipedia.org/wiki/Romance_copula)»
32. Wikipedia, the free encyclopedia di bin kategoriya Copula Deletion
33. Wikipedia, the free encyclopedia, Main article: Indo-European copula
34. Wikîpîdiya Serbest di bin serenavê The Hindo-European Kopula

### 10.3 Çavkaniyên zimanê Kurdî

35. Emir Djeladet «Alî Bedir khan et Roger Lescot(1970), Grammaire Kurde, (Dialecte Kurmandji, paris,
36. Mîr Hereqol Azîzan, Rêzana Elfabêya Qurdi, çapxana Terekî, Şam, 1932
37. Profesor : Piere Lecoq, Zanîngeha Sorbon- Parîs, Wergêr: Kevirê Dîko, govara Pirs, jimar 10.
38. Q. Kurdoyêv(1984): Rêzimanî Kurdî be kereştey diyalêktî Kirmancî û Soranî, wergernadina Dr. Kurdiştan Mukiryani, Emîndarêti giştî Roşinbîrî Lawan, Hewlêr
39. Qenatî Kurdo (Kordoyêv), rêzimanê zimanê Kurdî, Mosko, 1957
40. Reşîdê Kurd (1956), Rêzimana zimanê Kurdî, sham.

### 10.4 Bi Farisî

دستور زبان فارسي، حسين اندیشه، کتابفروشي امين، تهران

41. Hiseyn Endîşe, Deşt Zibanê Farisî, kitabfiroşî Amîn, Tehran.

### 10.5 Bi Arebî

42. Dektor Mihemed El-Tûncî, Al-Luxa Al-Farisiya we Qewaiiduha, Dîmeşq, 1967



---

# TAYBETMENDÎ Û ETÎMOLOJIYA ÇEND PEYVÊN KURDÎ

---

■ Bahadîn Robar

## **Di gelek gotar, nivîs, pexşan û di axaftinên xwe de me bal kişandiye taybetmendiya**

ên zimanê kurdî gelek hêlên wî gotine û ez dubare dibêjim; zimanê kurdî zimanek resen, civakî, dîrokî, kevnar, xwezayî û di heman demê de maka hemû zimanan e. Yanî zimanê herî pêşî mirov û mirovahî pê axivîne û bi wî zimanî hebûnên giyanewer (zindî) û yên nezindî (bêgiyan) bi nav kiriye, bêşik û bêgûman zimanê kurdî ye. Ji ber ku zimanê kurdî zimanê pêşî yê gel û neteweya ku ew ziman afirandiye hemû dahênan, vedîtin û kifşkirinên xwe li gorî girîngî û mercên wê serdemê bi nav kirine giyanê xwezayê tê de heye. Lewre zimanê kurdî çavkanî û jêderka zimanên Arî (Hînd-Ewropî) ye. Nîşane û delîla vê angaştê me jî xebatên arkeolojîk ên li Kurdiştanê hatine kirin û hê jî tên kirin in. Ji van xebatên arkeolojîk li Rihayê Girê Miradan (12.000 sal), li Erxeniya Amedê, Qotê Ber Çem (10.00 sal) û gelek bermahiyên dîrokî ku li Kurdiştanê hatine vedîtin didin xuyakirin ku mirovahiyê cara pêşî li Mezopotamyaya Jor yanî li Kurdiştanê derbasî jiyana gund û çandiniyê bûye. Ev jî tê wê wateyê ku gelê ku jiyana dêmanî daye destpêkirin proto-kurd (pêşiyên kurdan) in. Ev jî bi me dide zanîn û herwiha di şûnwarên ku heta niha kolandin lê hatine kirin de jî belge û delîlên teqez raberî me dikin.

Dema ev gel (kurd) derbasî jiyana gundewarî dibe êdî hem çandiniyê dike û hem jî sewalan xwedî dike. Her çandiniya kirine û ajalên ku kedî û xwedî kirine navek lê kirine. Her cure rewşa hewayê, karesat, riwek, ajal û hebûnên din li gorî xwezaya xwe bi nav kirine. Her navlêkirin li gorî şêwe, kêrhatin, û taybetmendiyan wê/wî tiştî hatiye kirin. Ger pêwîst be ku em çend mînakên bidin, em dikarin peyva “ba” bigirin dest. Çavkaniya rêbaza vê xebata ku ez ê niha pêşkêşî we bikim Alî Kardûxos e. Peyva “ba” di

Avestaya Zerdeşt de jî dîsa weke ku îro di kurdiya nûjen de tê bikaranîn- dihat bikaranîn. Wateya wê lez- lezgîn- zû û ji hil e. Vêca em berê xwe bidin peyvên ku bi wate an jî şibandina “ba”yê hatine çêkirin ka çavan in. Yek bi yek em ê wan li vir rêz bikin û li wate û honandina wan binêrin.

Badev: Bayê dijwar ê bi baranê re derdikeve holê û pir bihêz e)-

Bager: Bayek gelek dijwar sar û piçikên berfê di nav re dibare- leza wê û di saetekê de 70 km ye)-

Bahoz: Firtoneya bayê ya herî dijwar e û dema ev ba derdikeve dengê tîpa Z an jî S’yê jê tê)-

Bablîsok: Ji asîmanan heta erdê ji bayê xurtomek çêdibe û her tiştî li hev badide û li ber xwe dibe asîmanan û carinan wisa dijwar e ku daran ji ra derdixe.

Balon: Amûra bi bayê hatiye pifdan/dagirtin.

Baweşîn: Amûra ji bûjengek mîna plastîk- kaxiz û hwd. hatî çêkirin û bi awayê hejandine bayê çêdike û mirov xwe li ber wê bayê hênik dikin.

Bahor: Bayek nerm û hênik e).

Ev çend peyv rasteraşt di rewş û tevgerîna “ba”yê re peywendîdar in. Di hemûyan de jî ligel wateya wê ya esasî wateya lezgînî û zûbûnê jî heye. Weke mînak; dema bablîsok her tiştî dide ber xwe û li dorana xwe dizivire kurdan jê re gotine “badan”. Lewre dema mirov tişteki an jî du tiştan li hev dipêçe jê re “badan” tê gotin. Yanî bi hêza bayê ew tişt tê zivirandin (badan).

Baz: Teyrê bi navê “baz” ê ku di nava hemû balindeyan de yê herî lez û dikare biçe /bifire- navê xwe ji “ba”yê digire. Wateya wî weke” “ba”yê zû diçe ye.

Balinde: Peyva “balinde” ku ji bo hemû ajalên bi per û bask tê gotin jî rasteraşt bi lezbûnê re yanî bi “ba”yê re peywendîdar e. Dîsa wateya wê mîna “ba”yê an jî bi bayê re difire ye.

Bask: Çeng û perên balindeyan ku kurdî em jê re dibêjin; “bask” jî di wateya “ba”yê de ye ku bi bayê re dikare bifire û di hêz û leza “ba”yê de ye.

Bala: Peyva “bala” ku di kurdî de bilindî û hejandina tiştekî nîşan dide, di peyvê de tê xuyakirin ku bi hêza “ba”yê diheje û herwiha cihê herî bilind ku heta “ba” lê heye nîşan dide.

Bazdan: Peyva “bazdan” ku di kurmancî de weke “rev” jî tê bikaranîn, di wateya meşa herî lez û bez a mîna “ba”yê zû diçe de tê bikaranîn.

Balon: Her çi qas tirkan ev peyva kurdî kiribin malê xwe jî, ev pevek xwerû kurdî ye. Peyva “balon” a wateya tiştek ji “ba”yê hatiye dagirtin nîşan dide jî rasteraşt bi “ba”yê re peywendîdar e.

Balafir: Peyva “balafir” ku pir dereng ketiye di ferheng û lîteratûra kurdî de dîsa bi heman feraset û rêgezan hatiye çêkirin û di wateya mîna “ba”yê an jî bi hêza “ba”yê difire dide peyvê.

Bafirok: Pêlîştoka zarokan ku bi naylon û darikên zirav û tenik çêdikin û bi benekî dirêj ve girê didin û li ber bayê dixin jî navê wê “bafirok” e. Ew jî di wateya xwe de hêz û lez û erka “ba”yê nîşan dide.

Bang: Peyva hemwateya gazîkirinê ku bi hêz û leza bayê tê bihîştin jî di kurdî de “bang” e yanî bi “ba”yê deng diçe. Ji peyvê jî diyar dibe ku bi “ba”yê re peywendîdar e û qerqoteyê peyvê ji “ba”yê çêbûye.

Dema mirov bi baldarî berê xwe dide van peyvan di hemûyan de jî xuya dike ku li ser bingeha têgeha “ba”yê hatine honandin û wateya li jor firîn, lezgîn û zûbûnê dide peyvê. Jixwe “BA” piştî tîrêjan hebûna herî zû û bilind diçe/difire ye.

Ji ber ku mijara me etîmolojî û taybetmendiya zimanê kurdî ye, ez dixwazim çend peyvên ji “av”ê hatine honandin jî li vir raxim ber çavan. Tiştên ji avê çêdibin hema hema hemû wateya xwe di hundirê peyvê de didin der. Belko bi dehan zêetir peyvên bi vî awayî hene, bes ez ê li vir ji bo fêmkirin û girîngiya zimanê kurdî tenê çend peyvan binivîsim.

Sûlav: Di kurdî de ji deverên tehisînek/şemîtok re “sûl” tê gotin. Dema “av” ji deverên weke lat, zinar û kendalan ber bi jêr ve diherike, jê re “sûlav” tê gotin, yanî cihê ku av li ser dişemite/diherike.

Xunav: Di kurdî de barana hûrik û nermik e, weke tê dîtin qala avê dike.

Kunav: Qul an jî kuna ku av jê derdikeve, jêderka kaniyê.

Balav: Şuştina cil û bergan.

Gerav: Cihê ku av lê kom bûye li ew av li dorana xwe dizivire.

Serav: Devera ku serê herka kaniyê lê ye.

Navav: Navbera du robar, du dol, du kanî, du gol, du derya û hwd. Yanî navbera du avan.

Şorav: Ava ku xwê hatî tevlîkirin.

Xoşav: Ava şêrîn a ku fêkî di nava wê de hatî kelandin:

Derav: Karê cilşuştinê yê li ber keva kanî an jî robarekê.

Sorav: Ava bi rengê sor hatî rengîn kirin.

Zerdav: Ava zer a ji bedena zindiyan derdikeve û weke edav û îltîhap jî tê binavkirin.

Kendav: Peravê deryayan ê ji deryayê zêdetir di nava bêjî de maye.

Çirav: Erdê têrav ê ku her tim şil û dema zindiyek giran di ser re derbas dibe tê de diçikile).

Lîlav: Berfa heliyayî lê hêj tam nebûyî ava xwerû.

Şîlav: Perdeya amnîyotîk a di malzaroka dayîkan tije av û pitik di navê de ye.

Berav: Kêleka çem robar, co, gol derya hwd. yanî kêleka cihê ku av lê heye, tenişta avê

Bendav: Benda ji amûrên weke hesin kevir, çimento û hwd. hatî çêkirin û ji bo komkirin û berhevkirina avê tê bikaranîn.

Tengav: Erda bêjî ya zirav û hindik a di navbera du avan de

Perav: Kêleka çem robar, co, gol derya hwd. yanî kêleka cihê ku av lê

heye, teniştaya avê .

Girav: Erdê her çar aliyên wî ji avê hatiye dorpeçkirin

Germav: Ava bi awayek germ ji bi erdê derdikeve û li gorî baweriya gel selametî û şîfa tê de heye

Doşav: Ava şekir (qend) hatî tevlikerin, an jî ava ji tiştêk şêrîn hatî çêkirin û tê vexwarin e.

Û em dikarin bi dehan peyvên din ên ku rasteraşt wateya xwe di hundirê xwe de dihevinin li vir rêz bikin, lê belê ji bo mijar zêde dirêj nebe ev qas mînak bes in.

Nexwe em dikarin bi hêsanî bêjin ku peyvên kurdî rasteraşt bi xwezayê ve peywendîdar in. Dema mirov baş lê bikole etimolojiya wan derxe holê dê bê dîtîna hema hema hemû peyvên kurdî wateya xwe di nava xwe de dihevinin.

**\*Rêvebrê Komeleya Nivîskarên Mezopotamyayê**